17 rojnamevanan bersiv da nameyên me. 13 name bi hincetên cur bi cur li me hatin zîvirandin, yek jê li ser daxwaza şexsî li me hat vegerandin. Rêvebiriya girtîgehê bi hinceta ku bi teksîr e nameyek neda girtiyî. Pirê girtîgehan pûlên ku me xistibûn nav nameyan, ji zerfan derxistin û nedan girtiyan.

NAMEYA ÎÊ COTMEHA 202Î KU KOMELEYA ROJNAMEVANAN A DÎCLE FIRATÊ JI ROJNAMEVANÊN GIRTÎ RE ŞANDIYE

Merheba...

Hevpîşeyên min ê delal; em li ser Komeleya Rojnamevanan Dîcle Firatê ku meha Rê-bendanê ya sala 2020î bi mebesta parastina azadiya fikir û xwederbirînê û birêxistinîkirina piştevaniya rojnamevanan damezirîna xwe ragihandiyê xwe digihînin te. Serê pêşîn em li ser navê endam û rêvebirên komeleya me tevan hest û dilnên xwe yê piştevaniyê dubare dikin.

KRDF'ê ji roja ku ava bûye heta bi niha pêşî piştevaniya bi rojnamevanên girtî re ji xwe re kiriye hedef. Ne zehmet e texmîn kirina pirsgirêkên di girtîgehê de yê hûn bixwe jî rû bi rû ne. Helbet gava derxistina serî bi van pirsgirêk û tengezariyan re, divê hûn bizanin ku hûn ne bi tenê ne. Em wek komele dixwazin bişopînin rewşa we û şert û mercên hûn tê de ne. Her wiha, bi mebesta dana piştgiriya huqûqî û hem jî danbihîstina dengê we bi gel em dixwazin bi bîr bînin ku tiştê ji milê me tê em hewil didin ku bikin.

Em wek komele; ji xwe re dikin armanc ku di vê çarçoveyê de bi danîna têtikiliyê bi rojnamevanên girtî re bi rêya nameyan, pirsgirêkên hûn bi rû ne ji cihê cih guhdarî bikin û bikin ku gel bihise pê. Wek komele; em ji xwe re dikin armanc bi rojnamevanên girtî û yê dihên darizandin re têtikiliyêke bi bandor danîn, bibin hevparê pirsgirêk û tengezariyên wan, çareser bikin, dengê wan bi awayekî bi bandortir bidin bihîstin, û bi daneyên peyda dikin raporên amade bikin. Bi rêya parêzerên xwe serdana hevpişeyên xwe bikin, çavdêriya rewşa tê de ne bikin, ragihandin pirsgirêk û tengezariya wan û bi awayekî bihêztir piştgiriya huqûqî bikin.

Bi nameyên ji we tên û dane û agahiyên ji hevdiîtinên me bi rêya parêzeran bi dest xistine bi sê zimanan (Kurdî, Tirkî, Îngilîzî) bikin rapor û bi gel bidin zanîn. Vê raporê ne bi tenê bi nivîskî, bi sehekî û dîtbarî jî bi hêz bikin gihandina bêhtir kesan ji xwe re dikin hedef.

Ji bo pêkanîna van tevan tiştê em ji we dixwazin ew e ku di nameya ku hûn ê ji me re wek bersiv binivîsin de; dosyeya xwe ya dozê, pêvajoya darizandinê, dosyeyêke ku we ceza jê girtibe hebe û rewşa dawîn a dosyeya xwe û di der barê înfaz kirina cezayên we de agahiyên bi giştî û rojane par bikin.

Pirsgirêk û tengezariyên we yê di girtîgehê de, eger hebe xesp kirina maf a berpêyî we, nehuqûqiyên hûn bixwe rû bi bûne ya jî hûn bûne şahid em dixwazin hûn ragihînin me. Di der barê xebatên em ê bikin de em ê car bi car haya we pê bixin û li danîna têtikiliyê bi hev û din re dewam bikin.

Bi dawî kirina nameyê re, em cardin silavên xwe yê ji dil li we tevan dikin, li ser navê malbata Komeleya Rojnamevanan Dîcle Firatê hez kirin û hurmeta xwe radigihînin.

NAME HEYE JI ROJNAMEVANÊN GIRTÎ

Di vî beşê rapora xwe de em ê nameyên rojnamevanên girtî di der barê dozên xwe, pirsgirêkên rû bi rû ne nivîsîne em ê par bikin. Di heman demê de di quncikê "Name Heye ji Rojnamevanê/a Girtî" yê malpera me de hatine weşandin de daneyên balkêş jî derdixê holê. Nameyên ku hatine li gor rêza bi alfabeî ya rojnamevanên girtî em diweşînin. Beşên têtikildar ê nameyan wek xwe pêşkêş dikin.

Abdulkadir Turay

Nûçegihanê Mêrdînê yê Ajansa Nûçeyan Dicleyê ku hat Girtin
(Girtîgeha Tîp E ya Mêrdînê / Nameya 17ê Sermaweza 2021î)

(.....)

Hevalno! Em niha di girtîgehê de rû bi rûyê bandora nehênî ya atmosfera siyasî ya ji der ve ne. Me her dem li ber xwe da li dijê binpêkirinên nehuqûqî û kêfî yên rûmeta mirovahiye nahesîbinin, em ê li berxwedana xwe dewam bikin. Di vê kontekstê de heger bi kinasî be jî mirov balê bibe bi ser hin xalan de:

- 1- Bi qanûnên hatine derxistin bernedana hevalên me îspata ku dad li welatê serobino bûye. Hinceta bernedanan ew e ku em di qawîşên siyasî de ne.
- 2- Ji ber vê yekê bi hevkeşeya "ya radestî ya jî êsirî" bêhuqûqiyê ferz dikin. Di der barê vê de em nizanin bê ka ne baro ne jî xebateke bi cidî dikin ya na. Ez hevî dikim ku jî bo betal kirina van kirinan serîlêdanên pêwîst werin kirin.
- 3- Alav û amûr (bincilk, gore, şimik û hwd.) ên ji aliyê malbatên me ve tên şandin nadin me. Ji hewildana wan a ku dixwazin malên herî nebaş biha bifiroşin me, mirov têdighîje ku di nav kar de hesabê klîkên yekperest û rantparêz heye. Hevalên me yên sewqa wan a nexweşxaneyan dertê, ji ber ku daxwaz û helwestên 'rûmetşikên' ên jandarmayê yên di bin navê lêgerînê de dikin, red dikin nikarin biçin nexweşxaneyê. Lewma hevalên me yên nerehetiyên xwe yên kronîk hene nayên tedawî kirin û vêca nêxweşiyê wan a din çêdibe.

Hevpişeyên hêja, dixwazim behsa rewşa xwe bikim: Hûn jî dizanin ku ez hatim darizandin û bi neh salan hatim ceza kirin. Hêj jî girtî me. Numreya dosyeya min 2017/50 ye û, sê sal û sê meh in li Dadgeha Bilind e. Cezayê min hêj nehatiye erê kirin, li Dadgeha Bilind e. Înfaza min 6 sal 9 meh in, 5 sal û 8 meh in girtî me. Ji qedandina cezayê min re maye sal û meh. Lê wek ku min got dosye hêj li Dadgeha Bilind e.

Hevrêyê min; du meh berê dêya xwe ya pir jê hez dikim canê xwe ji dest da. Dayîna canê xwe ji dest a dêya min li ser min bandoreke derûnî kir û kesera ku mirina bi xwe re tîne bandorek hişt li ser min. Ji bo beşdar bûyîna cinazeyê dêya xwe min serî li dozgeriyê da lê bi hinceta nexweşiya koronavîrusê daxwaza min hat red kirin. Min nekarî beşdarî dêlindêza cinazeyê dêya xwe bibim, bi parnekirina êşê bi dost û hevalên xwe re di zindanê de wek ku ez di zindaneke din de bim çêbû li min.

Di nav xeyalên ku min dikirin de derketina ji der ve û gera bi dêya xwe re şikandina xura canê xwe hebû. Min pir dixwest bi destên wê yên fedakir em pê mezin kiribûn bigirim û maç bikim.

Ez her roj bergîdana keda pîroz a hûn didin ez ê çawa bidim dijiyam. Tu nabê, ew axaftina bi telefonê ya bi hevûdin re ya bi deh deqîqeyan diyaloga min a bi wê re ya dawîn bû. Ji ber şertên mejbûrî min nekarî careke din xwe bigihînim. Xeyal hîmên bingehîn in ku mirov ji pêyan dihêlin. Êşa pêkneanîna xeyalên xwe dikêşim. Şîna xwe di nava xwe de dijîm. Hem jî dûrê dêya xwe...

Hevalên hêja!

(.....)

Parastina rastiye bêtirs, gava bivê li dijê rastiye diparêzî divê mirov berdêl bide. Em wek rojnamevanên vî welatî dibin xwediyê çandeke jiyanê. Em hîne parastina nîrxên civakî û jiyanê bi şertê dayîna canê xwe bûn. Gava dora wê bihê em beyan dikin ku "Em bi qasê li ser canê xwe bidin hez ji jiyanê dikin. Bi gotinên "Berxwedan jiyan e" em mezin bûn. Me bi vê perspektîfê li çapemenî û rojnamevaniyê nihêrt. Sedema ku hewilê didin dengê me bibirin ew e ku em angajeyî pergale nabin. Tiştê dikeve ser milên me ew e ku wekh her car di rastiye xwe de israrê bikin. Bûyîna ji der ve ya jî di girtîgehê de ne astengî ye ji bo berxwedanê. Bero-vajiyê vê yekê, divê mirov li her derê têtikoşe.

Cengîz Doğan

**Midûrê Karê Nivîsê yê Rojnameya Mavi ve Kentê
(Girtîgeh bi Tîp T Hejmar 2 ya Şakrana Îzmîrê Nameya bi dîrok 1ê Mijdara sala 2021î)**

(.....) Di der barê rewşa xwe de we ji min agahî xwestibûn. Di der barê girtî bûyîn û doza xwe bi kurtasî ez dikarim van tiştan bibêjim:

Sala 2003yan li Nisêbînê min di rojnameya Azadiya Welat de dest bi xebatê kir. (Malbata min li Nisêbînê dijî û ez jî Nisêbînî me.) Di heman demê de min xebatê ciwanên demokratîk jî dikir. Sala 2003yan ji ber xebatên xwe yê rojname û di nav ciwanan de hatim girtin û salek bi şûn de serbest hatim berdan. Sala 2004an tevî komê hevalên xwe yê li Nisêbînê me rojnameyê heftane ya bi Tirkî- Kurdî ya bi navê "Mavi ve Kent" weşand. Ez jî gerîndeyê giştî yê vê rojnameyê bûm. Ji ber xebatên xwe yê rojnameya Mavi ve Kentê sala 2005an hatim girtin û di der barê hejmarê rojnameyê tevan de doz li min hatin kirin. (Niha aqûbeta dozê jî çî ye nizamim, ji wê boneyê dosyeyê Dadgeha Bilind.)

Pirê dozên min berdewam in û di der barê aqûbeta min de tu agahiya min nîn e. Dadgehê salan 2006an îlanên şehîdan, nûçeyên di der barê Kurd û Kurdistanê de yê di rojnameyê de, ji ber ku me peyvên wek Rêberê Gelê Kurd, Hêzên Parastina Gel, Kurdistan, Birêz, Gerîla û hwd. bi kar anîne salek û şeş meh û 20 sal cezayê hepsê dan min, ez serbest berdam. Piştî ku ez hatim berdan min cardin li xebatê xwe yê rojnamevaniyê dewam kir. Di demeke ku min dabû ser şopa nûçeyê defin kirinê cardin ez bi awayekî nehuqûqî hatim girtin û meh girtî mam. (Ez aqûbeta vê dozê jî nizamim.)

Heta sala 2009an a ku ez hatim girtin jî min li xebatên xwe yê nûçegihanî û gerîndehiya giştî yê rojnamevaniyê dewam kir. Nêzîkê 60 hejmaran rojname derxist.

Ji ber ku em hatin girtin yek carinan çap kirina rojnameyê radiwestiya. Ji wê boneyê hema bêje li her hejmara rojnameyê doz dihat kirin ya jî ji ewlehî û dozgeriyê dihatin, hişyar dikirin. Bi zexta siyasî, aborî û ewlehiyê asteng dikirin. Em jî neçar man ku çap kirina rojnameyê di dawiya sala 2008an de rawestînin. Ji ber van xebatên xwe di sala 2009an de di çarçoveya dozê "KCK Mêrdîn" û "KCK ŞIRNEX"ê de hatim girtin. Ji hingê ve girtî me. Di çarçoveya dozê de ceza li min hatin birîn. Ji hin dosyeyên min ên ji sala 2003yan heta bi 2009an bi tevahî 21 sal ceza dan min û niha hukumxwarî me. Bi ser de sala 2020an jî sê cezayên dîsîplînê û hucreyê dan min. Înfaza min jî şewitandin. Ango ji ber ku înfaza min hat şewitandin berdana min 5 salên din jî taloq lê ket. Bi normalî divê ez sala 2023yan bihatama berdan lê ji ber sê cezayên hucreyê û şewitandina înfaza min berdana min taloqê sala 2028an bû.

(.....)

Wek ku hûn jî dizanin demeke diyar e serlêdana îtirazê ji bo Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê. Lê mixabin ji ber ku parêzer bi bêberpirsiyarî tevgeriya û ez agahdar nekirim min nekarî serî li DMME'yê bidim.

(.....)

Niha di girtîgehan de zext û pêkûtî, binpêkirina mafan û mexdûriyetên mezin diqewimin. Bo minak; ji ber cezayên hucreyê (sê hucre) yê di çarçoveya cezayên dîsîplînê de tên dayîn înfaza me dihê şewitandin. Ev jî dibe sedema mayîna me ya bi 5-6 salan zêdetir di girtîgehê de. Ji du salan bêhtir e ku rojnameyên Xwebûn, Yeni Yaşam û rojnameyên Kurdî û yê mixelef tevan nadin me. Yanî qedexeyê ketina wan a girtîgehê! Ji kovarên bi rêya PTT'ê dişînin yekê bi tu awayî nadin me. Kovarên em dixwazin bi pereyê xwe jî bistînin (bi taybetî yê Kurdî û mixelef) ji ber ku di lîsta wan diyar kiriye de nîn in ji me re wiha dibêjin: "Em nikarin vê kovarê binin, qedexeyê ye." Du-sê sal in radyoyên pêlkin û dirêj distînin ji me. Sê- çar meh berê jî radyoyên me tev berhev kirin. Bi ser de ji ber ku radyo bi min re hebû carekê 15 roj careke din jî bi 8 rojan cezayê hucreyê dan min. Niha bi tenê radyoyên FM hene. Kenalên televizyonê tev ên medya alîgir in. Salixdanên rast em ji malbatên xwe hîn dibin, em wan jî bi awayekî pir bi sînorkirî digirin. Pirtûkên bi rêya PTT'ê dihên bi derengî be jî didin me. Lê hem bi awayekî sînorkirî hem jî piştî ku hinek li bal xwe dihêlin hêj didin. Lê ji her pirtûkekê yekê didin me. Bi hinceta pandemiyê kirinê çandî û werzîşî û kursên hunerî û pîşeyî û wd. rawestandine. Di odayên jib o 10-12 kesan de em 17-18 kes dimînin. Niha gelek hevalên me li erdê radizin. Bi tenê tiwalet û banyoyek heye. Heftayê carekê 10 kesan derdixin derve ji bo lîstina fûtbolê bi 50 deqîqeyan. Hevalên cezayê wan qediyayê bi hinceta qanûnê di meha Rêbendanê ya sala 2021î de hatiye derxistin nayên berdan û cezayê 6 meh ya jî salek dirêj kirin. Hevdîtinên vekirî bi hinceta pandemiyê bi du salan hatin betal kirin. Hevdîtinên girtî jî mehê bi tenê du car tên

kirin û 40 deqîqe ne. Tevî ku di qanûn de “Dibe ku hevdîtinek heta bi saetek, saetek û nivê dirêj bibe” hevdîtînên me bi 40 deqîqeyî ne. Di odayên temamên girtiyên edlî de telefonên bi dîmen bi cih kirine lê hêj di odayên me de bi cih nekirine û li gor ku dibêjin dê wî mafî nedin me. Tevî gelek tiştên di çapemeniyê de xuya dibin û dewlet wiha pê pesnê xwe dide: “Girtîgehên me hewqas hatine xweşik kirin.” Vî mafî bi tenê nadin me. nas nakin. (...)

Heval û hevpişeyên min ên delal! Pirsgirêkeke me û ya malbat me ya din jî ew e ku em ê sirgûnê girtîgehên dûrê malbatên xwe tînin kirin. Bo mînak; ez Nisêbînî me, dê û bav û xwişk û birayê min tev li wir dijîn. Ez sala 2009an hatim girtin û ez birim Girtîgeha Mêrdînê. Lê sala 2012an ez ji Girtîgeha Mêrdînê Tîp E yê ya Girtî sirgûnê Îzmîrê hatim kirin û nêzikê 10sal in li Îzmîrê girtî me. Ji ber vê dûrahiyê (Navbira Nisêbîn û Îzmîrê 1800 km ye.) malbata min nikare were dîtina min. Ev yek jî hem di warê aborî hem jî di yê civakî, fizîkî û derûnî de dibe sedema mexdûriyeta bi fizîkî. 10 sal in ji bo sewqê girtîgeheke nêzî malbata xwe werim kirin min gelek caran serî li Wezaretê Dadê daye lê her care hincetên beradayî serlêdanên min û malbata min red kirin. Ev pirsgirêkeke bi tevahi ye. Hem ez hem jî malbata min mexdûr dibe. Deh sal in ku bav û xwişkên min nikarin werin dîtina min. Çima? Çimkî çûyîn û hatin hezar û şeş sed km ye. Di zêrê de we pûlê posteyê jî şandiye, spas dikim. Lê rêvebiriya girtîgehê pûlên ji der ve tînin nadin me. Ji lewma ne hewce ye ku hûn pûlan bişînin. (...)

Elîf Ersoy

Berpirsiyara Karê Nivîsê yê Kovara Yürüyüşê (Girtîgeha Girtî ya Jinan a Buryana Kayseriyê Nameya 23yê Cotmeha 2021î)

Hem ji we hem jî ji yên me yên wan deran hatina nameyêke piştewaniyê ez pir kêfxweş kirim. Pûlê bi 16 banotan ê ji nav zêrê derket, tevî ku hîç nehatiye bikaranîn, nedan min: Ew jî nizanin ku çima dest didin ser tiştên me. Spas dikim ji bo piştigiriya we ya bi her awayî, hêviya biserketîna dikim ji bo we. Quwet be ji we re.

Heta ji min were ez ê bikevim hewila vegotina rewşa xwe ji we re. Duh (21ê Cotmehê) “Roja Rojnamevanên Cîhanê” tevan bûye. Ez ji pelê salnameyê pê hisiyam. Roja me ya rojnamevanan leqayê roja 45an a greva me ya birçîbûyîna hat. Tu li vê nakokiyê! Wek girtiyên siyasî yên din, wan ez jî bi zorê anîm vir û ji ber dûrahiyê nikarim hevdîtina ji bo serdanê bikim. Ji lewma tiştên li vir bi serê me de tînin nikarim rû bi rû bibêjim ji kesî re. Carinan nameyên min jî bi hinceta ku “bi teksîr” dibînin îadeyê min dikin. Cihê ez lê dimînim, cihê dosyeyên min lê dihên dîtina, malbata min, ê/a tê dîtina min, dibistana min yanî her tiştê min li Stenbolê ye. Lê ji bo min û herî tiştî ji hev û din vebiqetînin ez heta bi wan deran hatim sirgûn kirin. Ez girtiyekê çapemeniyê me, ji ber navê min jî di kunyeya kovara “Yürüyüş”ê ku kovareke yasayî ye de heye di dadgeha Cezayên Giran a 37emîn a Stenbolê ku Akin Gürlek serokatîya wê dikir de min “8 sal û 9 meh” ceza stend. Piştî du sal û nîvan ji bo çûyîna dadgehê gaziyî min hat kirin, mafê min pir hat bînpê kirin. Piştî sê mêhan ku ez bûm berpirsiyara îmtiyazê di girtina bi ser buroya kovarê de ya polîsan ez hatim girtin. Ji 2yê Tebaxa 2017an ve bêyî navbir ez girtî me. Piştî ku ez hatim girtim jî tevî ku derfeta ez kovaran bidim destê xwe û li wan binihêrim nîn bû ji kovarên ku çap bûne doz li min hatin kirin. Dosyeya ez ji ber girtî me hêj jî li Dadgeha Bilind sekinandî ye. Hevalên we yên parêzer li dosyeyê binihêrin, hûn ê bêhuqûqîya ez rû bi rû bûme û berdewam e bibînin; a rast min ne bawer e hûn şaşwaz bimînin, ew ji ber tabîeta xwe yên ku ne ji wan bin, herî pir jî dijminahiya me dikin. Ji ber dadgêrekî seyar ê biryara Dadgeha Destûra Bîngêhîn nas nake, dadgeh bi dadgeh digere zêdeyê çar salan e ku ez girtî me. Dosyeyêke min a din ku li Dadgeha Cezayên Giran a 13emîn a Stenbolê berdewam e heye. Berdewam e lê heta niha tu car gaziyê min nekirinê ji bo danişînê. Gava hejmar 500î me belav dikir ez hatim girtin, ev dosyeyê ji lewma ji “bûyîna endama rêxistinê” li min hat kirin. Ango her du jî bi heiman navrokê du doz ji “bûyîna endama rêxistinê” li min hatine kirin: Yek jê Dadgeha Cezayên Giran a 13emîn a Stenbolê ye, ya din jî Dadgeha Cezayên Giran a 37emîn a Stenbolê ye. Ji bo kirina yek a dosyeyan parêzerê/a min pir pê re mijûl bû lê dadgêrê biryara Dadgeha Destûra Bîngêhîn jî nas nake ev yek zû bi red kir. Ji ber nexweşîya xwe ji zû de bû ku min nedinivîsî, ez ê nameya xwe 25ê Cotmehê roja Duşemiyê bidim posteyê. Îro roja 45an a greva min a birçîbûyîna ye. Ji keynî av û çaya poşet mahtê min tu tiştî hilnahêne. Misêwa vedireşim, qewî nikarim rabim pêyan; destên min bi hev û din de hişyar dibim. Ez tu pîvanê nakim lê duh gava gardiyanan ez dîtîm hatin derî vekirin, panîk li wan çêbû, tansiyona min baş bû, hatime ser 46 kîloyan. Bi îsrar xwestin ku min bibin servîsa bi lezgînî, lê min qebûl nekir, cardin hatin û çûn.

ku tu encam jê negirtin ji servîsê hemşîre hat. Yanî ev cara ewil bû hemşîreyek hat dîtina min. Min israra vîtamîna B1'ê jê pirs kir, got ku hewilê didin ku peyde bikin, bi tenê li cihekî derman dîtine, dewlet êdî heqê wê nade: Min di serê serî de jixwe ji gardiyanan re gotibû ku ez qebûl dikim ku bi pereyê xwe bistînim. Ji bo dirêj kirina pêvajoyê ji hincetan bêhtir çi heye ka... Herî dawî, ji min re hat gotin ku eger ez ji hişê xwe ve biçim bêyî ku ji kesî bipirsim dê min rabikin. yekeya servîsa bi lezginî, li ser vê mijarê jî minaqeşe çêbû.

- Ji dozeke kovarê ya li Dadgeha Cezayên Giran a 36emîn a Stenbolê dihat dîtin jî min ceza girt, dosyeya min niha li Dadgeha Bilind e.
 - Doza protesto kirina qetilama li Pirsûsê ya niha li Dadgehê Cezayên Giran a 14emîn a Stenbolê dihat dîtin jî li Dadgeha Bilind e.
 - Hejmara asas a biryara îstinafê ya doza min li Dadgeha Cezayên Giran a 32yemîn a Stenbolê 2019/1475, hejmara biryarê 2020/761. (doza kovarê)
 - Dosyeyeke min a li Dadgeha Cezayên Eslî ya 14emîn a Enqereyê dihat dîtin heye.
 - Li Dadgeha Cezayên Giran a 27emîn a Stenbolê biryara HAGB'ê bi dîrok 06/11/2018 heye lê biryar di 05/12/2018an de eseh bûye. (Doza kovarê) Ji hinek dozên kovarê berat jî bûm.
 - Dadgeha Cezayên Eslî ya 2yemîn a Stenbolê
 - Dadgeha Cezayên Giran a 35emîn a Stenbolê
 - Dadgeha Cezayên Giran a 24emîn a Stenbolê
- Ji xeynê van; dozên ez nizanim di çi merheleyê de ne û kîngê hatîne dîtin jî hene.
- Dadgeha Cezayên Giran a 2yemîn Anatoliyayê ya Stenbolê
 - Dadgeha Cezayên Giran a 2yemîn a Bakirkoyê
 - Dadgeha Cezayên Eslî ya 3yemîn a Karabuk (Dema di girtîgehê de bûme doz li min hatiye kirin)
 - Dadgeha Cezayên Eslî ya 2yemîn a Karabukê (Di girtîgehê de bûme doz li min hatiye kirin)

Min behsa dozên ku li min hatine kirin kir ji we re îcar, bi hêvîya dîtina hev û din careke din hez kirin û silavên xwe li rêyî we dikim. Em di girtîgehan de bin jî û ji der ve bin jî heta ku ev bêdaletî hebin ev doz jî naqedin. Quwet û serkeftin be ji we re! Bimînin bi xêr û xweşî û dostanî û hêviyê...

Erdal Süsem

Edîtorê Kovara Eylûlê

(Girtîgeha Girtî ya bi Tîp F a Edîrneyê A-18- Nameya bi dîrok 15ê Mijdara 2021î)

(.....)

Hevalên delal; êz ê hewil bidim ku di çarçoveya kategoriyên diyarkirî bibim bersiv:

a- Pêvajoya Huqûqî

Li Stenbolê dema ku rojnamevaniya xwecihî û fanzînî dikir, li ser îfadeyê kesê bi navê Kerem Bükreyê ji aliyê polîsan ve bûye lixwemikurhatî li ser min da dest bi gera li min kirin sala 1999an. Min jixwe ew nas jî nedikir, ihtimala ku em di heman kuçeyê de bibuhurin jî nîn bû.

21ê Adara sala 2000î ez hatim binçav kirin ji ber îfadeyê lixwemikurhatê diyar. Ez hatim êşkence kirin li Şaxê Vatanê yê bi nav û deng ê hingê (di belgeyên Tîba Edlî de qeydkirî ye) û roja pêncan hatim girtin. Wek ku hûn jî dizanin, di demeke ku rojnamevan li kuçe û kolanan dihat kuştin, rojname dihatin bombe kirin de, berdêlê xwe ci bih kirina di pozîyoneke rexneyî û mixelef de giran bû û rojnamevanên mixelef, di deh salên dawîn de kiriyariyên rojnamevaniyê bi rêxistinên neyasayî ve dihatin kirin û dexilê "lêpîrsîna teror"ê dihatin kirin û bi sûcdar kirina "bûyîna endamê rêxistinê" dihatin girtin. Heman tişt bi serê min de jî hat; bi şanîdana wek hincet a îfadeyê lixwemikurhatiyê ez hatim girtin. Mijara mîzaha reş; kesê lixwemikurhatî di îfadeyê xwe de ji şikra min re gotiye ku ez wî nas nakim, û min nedîtiye. Tevî ku ew di rêxistineke cuda ya nelegal de bûye di der barê min de pir tişt bihîstine. Dinyaya xeyalî ya lixwemikurhatî ewqas berfireh bûye ku gotiye ji ber rêgeza "veşarî bûyînê" yên ji heman rêxistinê re xebitîne jî hev û din nas nekirine û haya wan ji kirinên hev û din nîn bûye. Li gel ku di rêxistineke cuda de bûye hay ji kirinan min hebûye. Bi çîrokên lixwemikurhatiyê yên di der barê min de ji xwe re kiriyê asas û "daraza biserêxwe" biryara girtina min daye bi lez û bez. Parastina huqûqî ya îsnadê dibê; lê parastina li hember gotinên ji xeybê ya jî ji afirîneriya zihnî di min denîn e.

Kesê li xwemikurhatî dîsa bi insaf tevgeriyaye, lê îdia bikira ku ez elametê qiyametê me min ê çi xwelî li serê xwe bikira?! Bibuhurin lê encax mîzaha vê rewşê were kirin. Ez qerf û henekên xwe bikim jî Dadgeha Ewlehiyê ya Dewletê bi ku destûra “eger mijar dewlet be tiştên din nelê ne” bi erka xwe rabû. Got bila berdewam be girtî bûyîna min... Kesê îfade da, hat û diyar kir ku wî bi araste kirin û zext û pêkûtiya polîsa îfade dane. Lê darizandina min sê salên ewil bi îsnad kirina bûyîna endamê rêxistinê berdewam bû. Ez li heviya berdan û beratê bûm, di rewşa delîl a dosyeyê de tu guherîn nîn be jî, bi destwerdana li dozgerî û heyetê hat kirin îdianame ji endamtiyê bi “xera kirinê pergala Destûra Bingehîn bi tundûtûjîyê” têkildar kirin terfiyê xala 146/1î hat kirin. Dadgeha Ewlehiyê Dewletê ya bi hejmar 4 a Stenbolê cezayê hetabihetayê da min! Sala 2005 an dosye çû Dadgeha Bilind, Dadgeha Bilind got hewqas ceza zêde ye, hukm û delîl ne li gorî hev in û biryar xera kir. Cihê ku dadgeha xwecihî bi ya Dadgeha Bilind bike, Dadgeha Ewlehiyê ya 4an Stenbolê ji biryara xwe nehat xwar. Di 13ê Xezîrana 2007an de heman biryara -hetabihetayê- da û tehliye kir. Li gel ku nêzikatiya Dadgeha Ewlehiyê Dewletê ya 4an li ber çavan e bi biryara hetabihetaye darizandina ne bi awayekî girtî bi awayê veşarî ew e ku dibêje: “Biçe”. Min û Xirant Dînk bi hev û din re avjenî kiriye, ez ê bi kû de biçim. Em bibêjin ez çûm, cihê em çûn dê qet bêadeletî û neheqî nîn bin? Li hember bêadeletî û neheqî yê em ê xwe ker bikin qey? Em ê li wan deran jî rexneyan li bêadeletî û neheqiyê bikin, dê li wan deran jî bi darizandinan bikevin hewila dev berdana me ya jê û li wan deran jî em ê bihên girtin.

Piştî ez hatim berdan, min dest bi weşandina Kovara Eylûl Sanat Edebiyatê kir û edîtoriya wê kir. Di navbira 13ê Xezîrana 2007an û 1ê Sibata 2010an dewam kir li weşandina Eylûlê û min da ser şopa darizandinên dosyeya ez hatime berdan. Dadgeha Bilind bi heman hincetê biryara Dadgeha Ewlehiyê ya Dewletê ya 4an xera kir û darizandin ji nû ve dest pê bû. 1ê Sibata 2010an, hevdîtînen min li ser navê Kovara Eylûlê kirinê, kirine hincet û ez biçav kirim û hatim girtin. Biçav kirin û girtina min wek “operasyoneke rêxistinî” nişan dan û bi îdiayên bêesl û fesil hat pêşkêş kirin. Armanc bêyî îdia bi rêya medyaya giştî zextan di darazê rabike û fam û ferasetê bi rê ve bibe. Ji vê dosyeyê nêzikê du salan ez hatim darizandin û serbest hatim berdan. A rast jî ev bû. Lê mexseda esil ew bû di dosyeya beriya wê de zextan di Dadgeha Bilind rabikin û bibin asteng li dijê israra di biryara xwe de. Ev yek pêk anîn. Beriya rûniştina dosyeya 2yan a ez hatim berdan Mijdara 2011an Dadgeha Bilind a Hejmar 4 (Bû Dadgeha Cezayên Giran a 12emîn) biryar erê kir. Min dest bi mayîna girtî ya hetabihetayê kir. Ji ber ku hingê mafê serîlêdana bi takekesî ji bo Dadgeha Destûra Bingehîn nîn bû, rêya huqûqî girtî bû bi parêzerê xwe me dosye bir Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê. Di encama hevdîtînen DMME'yê yên bi Dewleta Komara Tirkîyeyê re kirin, dewletê bi teahud kirina di çarçoveya dosyeyê de “mafê darizandina bi adîlî bi awayekî sistematîk hatiye binpê kirin” û ev binpê kirin dê bi darizandina ji nû ve ji navê were rakirin; dosye “bi biryara darizandina ji nû ve” xera kir. Gulana sala 2019an.

Bi biryara DMME'yê û bi teahuda Dewleta Komara Tirkîyeyê bi daxwaza “darizandina ji nû ve û berdanê” min serî li Dadgeha Cezayên Giran 12emîn a Stenbolê xist. Dadgehên xwecihên li dijê biryar û îçtihadên DMME'yê û DDB'ê li ber xwe dan, li dijê daxwaza min jî li ber xwe dan. Biryara darizandina ji nû ve red kir. Min jî dosyeya di Avrêla 2020î da bir Dadgeha Destûra Bingehîn. Mejbûriyeye qanûnî ye ku divê biryareke bi banekî bi biryara Dadgeha Destûra Bingehîn û Dadgeha Mafê Mirovaan a Ewropayê û teahud/ qebûla li ser dosyeyê ya Dewleta Komara Tirkîyeyê ve bide. Bi biryara DMME'yê divê ez ji nû ve bihatama darizandin û serbest bihatama berdan. Dadgeha xwecihî xwe dide erdê û dema hukumxwarî bûyîna min a bi neheqî dirêj dibe. Ji xwe dike ku 20 sal bibuhurin di ser dosyeya min a min jê hukum xwariye.

b- Rojnamevanên girtî;

Bi zêde bûyîna zext û qedexehiyên li ser azadiya xwederbirin û çapemeniyê û darizandin û girtina rojnamevanan beranberê hev in. Serencama deh salên dawîn a Tirkîyeyê jî îspata vê yekê ye. Hejmara kesên dihên darizandin û girtin qat bi qat zêde bûye. Rojnamevanên radestê sansor û xwesansor kirinê nebûne/ bi exlaqê rojnamevan bûyîne ve girêdayî mane ya ji rojnameyên lê xebitine dawî li karê wan hatiye anîn ya neçarê îstifa kirinê hatine hiştin. Pirê van hevalan di warên cuda de dikarin debara xwe bikin, hewilê didin ku bi rojnamevaniya înternetê û rojnamevaniyê dewam bikin. Bi ya min pirsgerêka sereke ya rojnamevanên girtî hiştina bêpar ji hilberîna fikrî ye. Ev fikir ne bi tenê ji rojnamevanên girtî, lê ji bo girtiyên bi sedemên siyasî hatine girtin tevan e. Xwendkarên pirsgerêka cih û war protesto kirine heta bi daxwaza perwerdehiya bi zikmakî kirine, ji parlamentê mafê xwe yê biserêxwe bûyîna li ser kursiyî heta bi şaredaran, ji aktîvistên partiyên siyasî heta bi yên xwedî kirinên komeleyî û hwd. tevan e. Xemgîn im ku dibêjim, feraseta civaka demokratîk û sazîyên demokratîk a berpêyî girtiyên siyasî ji xeynê çend girtiyên populer, eger ne şaş bim kirina miemeleya miriyan e. Heta bihên berdan em terkê malbatan hatine kirin, malbat jî yek carinan ji bo şikandina

xura canê xwe dihên serdanê, bi peyde kirina çend weşanên bi çend qurûşên radizînin hesabê me em mane. Wek ku odeyeke mayîna li bendê bin bûye li me. Fikir, tercih û vîna dayîna biryarê ya mirov ji nav derbixe dimîne qerqodekî ji goşt-hestî ku dikare fotosentezê bike.

(.....) Di vê barê de, ji ber ku heps kirina rojnamevanan ne takekesî lê civakî ye, desthilatdarî ji bo tirsandina civakê, rakirina ji navê ya aqlê azad û rexneyî, tepisandina fikra pircurî û ava kirina civakeke yekrengî...ji xwe re kiriye armanc, ji bo xera kirina vê lîstikê ya ji dayîna geşeyê bi pêvajoya hiştina ji paj re û red kirinê, bi ya min divê rê û delîveyên fikr û ramanên rojnamevanên girtî nişan bidin werin vekirin. Gava rojnamevan bihên ceza kirin pênûsa wan naşike, eger ku nekare fikr û raman, rexne û şîroveyan xwe nekarin bigihînin gel dê hingê pênûsa wan bişike. Hingê desthilatdarî bi girtinê digihîje armanca xwe, wateyeke hêja ya mayîna di girtîgehan de jî namîne. Girtî tev wisa difikirin ya na ez nizanim lê bi ya min a sereke ew e ku bêyî bê qedr û qîmet kirin û sivik kirina pirsgerêkên wek darizandin, huqûq û tenduristî û wd. domandina hilberîn û afirîneriya fizîkî û ya rojnamevanên girtî û pêşkêş kirina ji gel re ya van e.

c- Şert û xesp kirina mafan

Ez hema bibêje qet rû bi rûyê xespeke ji bo şexsê xwe nebûme. Em rû bi rûyê tengezarî û xesp kirina mafan ên hevpar di girtîgehên li bi Tîp F de.

Sê sal in ku em nikarin hin weşanên li ser navên me dihên şandin bigirin. Em hin ji wan jî bi hêwîldanên burokratîk ên dûvdîrêj dikarin bigirin. Tevî ku di qanûn û huqûqê de nîn e, rêvebiriyên girtîgehan xal (mafê qebûl kirina diyariyên ji der ve dihên şandin)a 69emîn Qanûnê bi Hejmar 5275 dike hincet û biryara desteser kirina weşanan dide. Îtirazên me bi nişandana wek hincet a xala 62yan a heman qanûnê bi qebûla Dadgêriya Înfazê û Dadgeha Cezayên Giran, dixin nav bendê sisêyan ê xala 62yan ê qanûnê ku li gor vê yekê girtî dikarin weşanên hunerî-wêjeyî bigirin lê nikarin yên siyasî bigirin û nadin. Ji zû de ye ku ketime hewla standina kompitureke ji bo şexsê xwe. Tevî ku mînakên emsal (bo mîna Tîpa F ya Kocaeliyê) hene rêveberiya girtîgeha vê derê qebûl nake. Di seetên mesaiyê de di warekî ku rêveberiyê diyar kiriye de mînakên bikaranînê hene. Rojnamevan-nivîskar bûyîna min jî têr nake. Ji bo daktîlo kirina xebatên xwe yên edebî û felsefî min pêdivî pê heye. Di vê mijarê de hûn di warê huqûqê de bibin alîkar ez ê kêfxweş bibim. Çimkî gava nivîsên werin ji der ve werin daktîlo kirin û fotokopiyên wan werin şandin, fotokopî jî nahên dayîn. (Du sal berê dihatin dayîn.)

Niha bes ez ê pirsgerêkên wiha yên pêwîst bidim zanîn.

Hevalên ezîz, spas ku we pûl şandin ji me re lê pûlan nadin. Ji ber ku nadin ne hewce ye hûn bişînin. (.....)

Fatih Özgür Aydın

Midûrê Karê Nivîsê yê Kovara Kamu Emekçileri Cephesi (Girtîgeh bi Tîp F ya Edeneyê - Nameya 1ê Mijdarê 2021î)

Ez silavên xwe pêşkêş dikim ji Girtîgeha F ya Edeneyê.

(.....)

Di pêvajoyeke ku kedkarên çapemeniyê tim û tim rû bi rûyê zextan in û gef li wan dihê xwarin, dihên girtin, rû bi rûyê êrîşan dibin, hewil didin bi birîna îlanê ya medyaya nivîskî û dîtarî, rawestandina weşanê, bi cezayê pere bitepisînin, giringiya birêxistinbûyîna gelek pir e. Ez jî sala 2015an roja ku bûm endamê Sendîkaya Rojnamevanan a Tirkîyeyê binçavî bûm û hatim girtin. Piştî ku demekê girtî mam hatim berdâm. Lê meha Mijdarê ya sala 2017an cardin hatim girtin û ji hingê ve girtî me.

Ez sala 1981î li Stenbolê çêbûme û li Stenbolê dijîm. Zewicandî me. Min beşê birêvebirina cemaweriyê yê Zanîngeha Anadolu ya Eskişehirê kuta kiriye. Piştî ku di kovara "Halk İçin Mühendislik Mimarlık"ê de bûm Midûrê Berpirsiyar ê Karê Nivîsê di kovara "Kamu Emekçileri Cephesi" meha Mijdarê ya sala 2017an hatim girtin.

Kurteagahî di der barê dosyeyên ji ber dihê darizandin:

- 10 sal hikmê bi îdiaya "bûyîna endamê DHKPC'yê li Dadgeha Bilind e. (Niha ji ber vê dosyeyê girtî me.)
- Hikmê 4 sal 9 mehan ê bi îdiaya "Propaganda, mixelefeta qanûnê meşên civîn û xwenîşandanan û dayîna li ber xwe li dijê karmendên erkdar" jî li îstinafê ye.
- Du dosyeyên min ên bi heman îdiayan berdewam in. Ji xeynê van ji sê dozên ji ber

zext û pêkûtiyên di girtîgehan de li min hatine kirin ji yekê jî bi îdia “zirar dayîna malê cemaweriyê” 5 meh+HGB hat dayîn. Di du dosyeyên din de darizandin berdewam in.

Kirinên min ên rojnamevaniyê ku ez ji ber dihêmin darizandin:

- Di dosyeya ku ez girtî me de rojnamevaniya kirina hinceta “bûyîna endamê rêxistinê”. Bûyîna Midûrê Berpirsiyar ê Kare Nivîsê yê Kovara Kamu Emekçileri Cephesi, di dosyeyê de; wek bi rêxistin kirina qada karmendan a rêxistinê hatiye nîşan dayîn û hatiye îdia kirin ku ez “berpirsiyarê qadê” me. Çûyîna min bajarên cihê bi cihê û firotina kovarê, wek “ji bo çekirina civîna rêxistinê” hatiye nîşan dayîn. Sala 2017an çûm Amedê ku ji bo vekirina buroya kovara me li cih binihêrim. Hat gotin ku îxbara “tu bombeya zindî yî” heye, li nava rêyê, du polîsên bi êlêken pola yên tevî çekên lûledirêj ez binçav kirim û piştî hiştina di bin çavan de bi deh rojan li dadgeha ku dozgêriyê bi daxwaza girtinê ez neqil kirim serbest hatim berdan.
- Di dosyeya ez ê 10 Mijdarê 2021î di der barê esasê de li dijê mitaleayê parastinê bikim hingê lîsta nav û nîşanên girtiyên em ê kovara “Halk için Mühendislik” a ku ez midûrê berpirsiyar ê karê nivîsê yê wê bûm bi îdiaya “îspata ez têkiliyê bi endamên rêxistinê yên di girtîgehan de datînim” wek delîl hat hesab kirin. Ev û kirinên bi vî rengî yên rojnamevaniyê, wek hinceta “bûyîna endamê rêxistinê” dihên nîşan dayîn. Agahiyên di der barê dosyeyên min de wiha ne.

Agahî di der barê binpêkirinên mafan ên em rû bi rû dibin:

Helbet ne mimkûn e ku vegotina binpêkirina mafan di girtîgehan de bi çend rûpelan.

Di vê mijarê de ên bikarin pirtûkan binivîsin - û nivîsîne- kuliya teke heye. Ji lewma ez ê behsa yên sereke bikim:

- Bi derketina nexweşiya koronayê re gelek mafên me hatin xesp kirin. Mafê me yê sohetê yê di hefteyê de 10 seet bû, lê encex bi du seet û nîvan pêk dihat bi sînordar kirinên koronayê re bi temamî hat rakirin. Hevdîtînen girtî-vekirî serê pêşîn bi temamî hat rakirin, di pey re bi sînordar kirina mehê bi du kesan re û du rojan, bi awayê hevdiştina girtî dihê kirin. Gava ji ber dadgeh-nexweşxaneyê em mecbûrê derketina ji derveyê girtîgehê bibin, piştî vedigerin em 15 rojan di karantînayê de dihên hiştin. Di dosyeyên em dihên darizandin, dadgeh koronayê dikin hincet, beşdar bûyîna danîşînan bi SEG-BİS'ê li me ferz dikin.
- Xwegihandina weşanên demkî bi şertê abonetiye dihê sînordar kirin. Mirov ne aboneyê weşanên demkî be, kovara bi rêya postayê dihên nadin. Em bibin abone jî, hejmarên beriya bûyîna abonê derketine, bi hinceta ku em di wê tarîxê de ne abone bûne nadin. Kovarên malbatên me bi pereyê xwe distînin û bi rêya postayê dişînin, tê gotin ku dê bi rêya rêvebirinê pereyê wê dê bihê dayîn û nadin. Serê mirovî deh pirtûk dikevin ji xeynî wan nahêlin. Bi hinceta “mafê weşanê ya ragihandinê” yê Saziya Çapemenî û Ragihandinê nîn e, rojnameya Evrensel û Yeni Yaşamê nadin.
- Nexweşiyên min ên wek Crohn (Nexweşiya kronîk a hûr û rodiyan), di hestiyê milê min ê rastê de kîst û netêr bûyîna mîtral hene. Divê bi rêk û pêk biçim nexweşxaneyê (tehlîl, MR, EKO-EKG, rontgen, kolonoskopî) bidim kirin. Lê tevî ku dema kontrolê buhuriye, ji ber ferz kirina “nihêrtina li dev” min nabin nexweşxaneyê. Ne ez bi tenê me helbet. Girtiyên siyasî tevî ji ber ku vê kirinê red dikin, wan nabin nexweşxaneyan, mafê wan ê tedawî bûyîne dihê asteng kirin. Leşker, beriya siwar bûyîna me ya li wesayîta rîngê dema gerîna li ser û binê mirov ji me dixwazin ku em maskeyê xwe deynin, devê xwe vebikin û zimanê xwe derbixin. Beriya hatina pêşberê leşkeran tevî ku em sê caran di lêgerîna (bi dest, dedektor, x-ray) ê re dibuhurin ve ferz kirina leşkeran, bizaveke rûmetşikên, kêfî û nehuqûqî ye. Ji xeynê wê jî rayeyeke wiha ya leşkeran nîn e. Raye ya bijîşkê saziyê ye. Her wiha di pêvajoyeke ku nexweşiya koronayê heye û her roj zêdeyî 200î kes canê xwe ji dest didin, li gel tu dihê zanîn nexweşiyên min ên kronîk hene danîna maskeyê û vekirina devê xwe, hewldana ji bo cinayetê ye. Ji ber ku kontrolên xwe nikarim bikim ji nexweşiyên min roj bi roj bi pêj de diçin. Ez bawer im hûn ê di vê mijarê de bibin alîkar ji bo em dengê me bihê bihîstin.
- 27ê Cotmeh 2021î ji aliyê komeke gardiyan a bi taybetî ji Enqereyê hat, alav û amûrên me li hev xistin, di bin navê lêgerîne de talan û tajan kirin. Li hicreya ez tê de bûm jî alav û amûr tevî li hev xistin. Destên xwe yên qirêj ên bi her derê dabûn bi xwarin û cil û bergên me jî dan. Hilcoyan cilan şikandin, zerfên nameyan qelaştin. Radyoya me ji kantîne kirîbû ji me standin. Dest dan ser kovarên me Yürüyüş- Tavrê. Tirşiyên me yên me kelemên mor, xwe û ava me ji kantîne kirîbû û çekiribû ji me standin. Alav û amûrên me avêtin erdê. Ji ber ku me ji bo protesto kirina vê talanê diruşm berz û bala kirin û li deriyan xist lêpîrsîn li me hat kirin.

Ferhat Çiftçi

**Nûnêrê Rojnameya Azadiya Welat ê Dîlokê
(Girtîgeha Bi Tîp F Bi Hejmar 1 Tekirdağê A-27
Nameya 5ê Rêbendana 2021î ya bi rêya Hüseyin Aykol nivîsiye)**

(.....)

Wek ku hûn dizanin sal û nîvek berê ez zûzûka sirgûnê vê derê hatim kirin. Ev der qewî li min hat. Pêşî pirsgirêkên min mahd û hûr û rodiyan zêde bûn. Bi dûv re pirsgirêkên fizîkî çebûn bi min re. Di nav du sê rojan de hema bibêje mam li erdê. Di testê EMG yê herî dawî meha Îlonê li nexweşxaneyê zanîngehê hat kirin di noronen motorê de blok tespît bûn. Nexweşyêke bi navê İnflamatuara Kronîk a DemiyelinîzanPolînoropatî (CIDP) tespît bû. Eger ez ne şaş bim nexweşiyên min û yên fizîkîzan Stephen Hawking yek in. Ku cihekî canê min kêr digire pêşî li lingan, ji wir jî li tevahiya pergala sinêrê belav bûye. Ji lewma pergala sinêran xera bûye. Ev jî dihê wê wateyê ku sehekên min tev, organên min ên ji hundir û ji der ve tev xera bûne. Dibe sedema pirsgirêkên hevşengî û ketina ji hêzê, çûyîna hest, bêhnû tahnê, xelîna mahd a bi tundûtûjî, neliheviya koordînasyonê û gelek pirsgirêkên din. Yanî tevahiya organên bi masûlkeyan dixebitin bi karîgerî xera dibin. Dan û stendina bêhnê pir zehmet dibe. Demeke dirêj nexweşiya min nehat teşhîs kirin. Piştî ku teşhîsa nexweşiya min hat kirin ez demekê di nexweşxaneyê de mam. Paşê tedawiya kortîzonê bûm. Hêj jî li kortîzonê dewam dikim. Niha rewşa min ji berê pir baştir e.

Eger tam baş nebûbim jî edî bi qase ku îhtiyacê xwe bibînim berexêrî bûm. Bijîşk jî dibêjin ku dê sibê roj baştir bibe. Di qanûnê înfazê hin guherîn çebûn. Ji hevalên min ên dosyeyê Nuh Taş nivîsiye ku ji xalên "dayîna li ber xwe li dijê karmendan" û 7/2 yê 3113an daxistina înfazê girtiye, cezayê wî ketiye. Min serî lê da hat red kirin. Ji xeynî wê jî biryara pilot a "rêgeza xwe ya qanûnî nîn e" yê ji xala 220/6 ê Qanûnê Ceza yê Tirk ê Dadgeha Destûra Bingehîn heye. Anku dihê diyar kirin ku yê ji vê xalê ceza girtinê mafê wan binpê bûye. Ji ber ku wekalet di destê parêzerê min ê heyî de ye nikarim serî li parêzerêkî din jî bidim. Malbatê xwe ji internetê xwe gihand numreyêke telefonê lê bersivê nadin. Ez bi moral pir baş im.

(.....)

Bila sala nû ya kedkarên çapemeniyê tevan pîroz be, hêviyê dikim ku sala nû bibe wesîleya azadiyê.

Gokhan Gümüş

**Nûnêrê Azadiya Welat ê Dêrsimê
(Girtîgeha Bi Tîp T ya Samsunê - Nameya 29ê Mijdara 2021î)**

Silav, hez û hurmeta xwe pêşkêş dikim, hêviya min ew e ku hûn baş bin

(.....)

Demek berê min berhema şanoyê ya bi navê "Mayîna li Benda Godot'yî a Samuel Beckettî xwendibû. Du karakterên bingehîn ên berhemê Vladimir û Estragon difikirin ku dê bi tenê bi dîtina kesê bi navê Godot ji tengezariya tê de ne xelas bibin û ev berhem bi hêvidariyê diqede. A rast ne zahmet têgihîştina ji berhemê ku ya rast di şexsê Vladimir û Estragon de behsa civakê bi tevahî dihê kirin. Rêya çareseriyê bi dîtina Godot'yî ye û di vê lêgerînê nabe ku mirov hewldanên Çapemeniya Azad nebîne.

Girtîgeh ne ji derveyê pirsgirêkên aborî, siyasî û çandî ku niha bi asta xwe ya jortirîn em rû bi rû ne. Xedariya pirsgirêkên aborî xwe di girtîgehan de jî dide der. Pirsgirêkên siyasî bi kûr bûn berdewam in. Bi pandemiyê re nêzikê du salan e ku pêvajoyêke tecrîdê ya nerasterast heye. Ev tecrîd kirinê sistematîk bûne kûrtir dibe. Herî dawî bi meriyet bûyîna guherîna înfazê kirinê taybet ketin rojeva girtiyan. Li ber çavan e ku bi taybetî girtiyên siyasî mihatabê vê sepandina nû ne. Bi taybetî girtiyên dîroka berdana bi şert û merc a wan hatiye bi hincetên biçûk bernedana wan nîşaneyê herî berbiçav e. Mixabin ev her ku diçe belav dibe û aşkere ye ku ev yek perçeyekî qeyrana siyasî ye. Aliyê trajîkomîk jî hincetên ku didin ber in. Hincetên razber û bê wate yê wê wek "hay ji paqijiyê nîn e, daxwaza hevdiîtinê bi waizê di yekeya manewî re nake, ji aliyê malbatê ve nayê ziyaret kirin, beşdarê çalakiyên civakî-çandî nabe." Şandina

pirê girtiyar, girtîgehên bi sedan kîlometre dûrê malbatan ji xwe awayekî ceza kirinê ye û bi ser de vê yekê di eleyhê girtiyar de bi kar tînin! Nêzîkê du salan e ku pandemî heye jixwe!

Di nameya xwe ya dawîn de we pîrsa agahiyên cezayî kiribû. Ji meha Gulanê ya sala 2011an ve di girtîgehê de me. Di encama doza li min hatiye kirin bi tevahî min 15 sal ceza girtiye. Niha ji berdana min a bi şert re şeş meh mane. Lê ji ber sepandina înfazê ya min behsa wê kir nikarim tiştêkî eseh bibêjim.

(.....)

Harun Reşit Çümen

Midûrê Karê Nivîsê yê berê yê Rojnameya Zamanê

(Girtîgeha Bi Cur L ya Kepsûtê ya Balikesîrê Qawîşa C Nameya 7ê Mijdara sala 2021î)

(.....) Ez Harûn Reşît Çümen. 46 salî me, zewicandî û bavê çar zarokan im. Bi sûcdar kirina bûyîna endamê rêxistina teror ji aliyê Dadgeha Cezayên Giran a 32yemîn a Stenbolê di 18ê Tîrmeha 2019an de bi 7 sal û şeş mehan hatim ceza kirin. (Asas 2018/188, Biryar 2019/250) Daîreya Ceza ya 16emîn a Dadgeha Bilind, daxwaza min a temyîzê bi roj 29/09/2020, bi asas 2020-1637 û bi biryar 2020/4453yê red kir û biryara di der barê min de erê kir. Hêj jî girtî me. Serîlêdan (2021/5216) a bi şexsî ya min ji bo Dadgeha Destûra Bingehîn kiriye hêj bi encam nebûye.

4ê Adara 2018an hatim binçav kirin. Ji 8ê Adara 2018an ve di girtîgehê de me. 45 meh in ku ji azadiya xwe bêpar im.

Ji meha Îlonê ya 1995an heta bi 15ê Tîrmeha 2016an min nêzîkê 21 salan rojnamevanî kiriye. Min nûçegihanî kir di Ajansa Nûçeyan Çihanê û Rojnameya Zamanê, editoriya aboriyê, Edîtorî û Midûriya Berpirsiyar a Karê Nivîsê kiriye. Endama Civata Rojnamevanan a Tirkiyeyê û Komeleya Rojnamevanên Aboriyê me.

Tiştên di der barê neheqî û nehuqûqiyên rû bi rû mame de binivîsim pir in, nizanîm ez ê ji kîjanê dest pê bikim!.. Ez ê hewil bidim ku bi kurtasî bibêjim; dikarim wiha bi rêz bikim;

1- Pêşî ji dosyeya bûyîna endamê FETO ku ez ji ber di girtîgehê de me. Bi tenê ji ber ku min di rojnameya Zamanê de rojnamevanî kir ez hatim ceza kirin. Wek ku min di temamî merheleyên darizandinê de jî diyar kiriye;

* Min bernameya agahdar bûyîna ji hev û din BYLOCK'ê bi kar neaniye.

* Min bi talîmat pere ranezandîye Bank Asyayê, bi tenê hesabê min ê meaş hebû, saziya ez jê re dixebitîm ji ber ku bi vê bankayê re dixebitî divê min di wir de hesab vebikira.

* Di der barê min de îfadeyên şahid û şahidê veşarî nîn in.

Tu karekî min ê bi dizî çênebûye, bi tenê ji nanê xwe, kirina debara xwe ez di rojnameya Zamanê de xebitîm. Ez teqez ne endamê rêxistina teror im, min bi tenê rojnamevanî kir. Sûcdar kirinên li min xebitîna di rojnameya Zamanê de û hesasê meaşê di Bank Asyayê de, ew jî ji ber ku di rojnameya de dixebitîm, endamiya Sendîkaya Pak Medya-İşe û hevdiştina bi nivîskarê giregir re bi salan berê ne.

Cihê ku bihêman berdan sedema bi ceza bûyîna; lêpîrsîn û dozên heqaret li Serokkomarên di der barê min de ne. Di biryara xwarina hukm ya di der di barê min de bi awayekî bi surprîz ev xusûs bi aşkerekî hatiye destnîşan kirin. Lê belê dozên heqareta li serokkomar di dema darizandinê de ji min hîç nehatin pîrs kirin, parastina min nehat girtin. Di salên 2012-2015an de ji ber ku min midûriya berpirsiyar a karê nivîsê kiriye nêzîkê 100 doz li min hatin kirin. Ji van dozan nêzîkê 30 heb jê heqareta li serokkomar in. Ji ber nûçe û nivîsên quncikan ên di rojnameyê de derketine dihêman darizandin. Min ji pirê wan berat kiriye. Lê min ceza jî stend. Di dozên çapemeniyê de ji heqareta li Serokkomar 11 sal ceza (Ji ber nivîsa quncik a Veysel Ayhanê bi eslê xwe nivîskarekî Amedî ye), du caran deh meh ceza girtiye. Bi tevahî 31 meh heps. Tev li temyîzê ne. Ji xeynê van bi giranî ji tekzîpan gelek cezayê pereyî hat dayîn. Pêvajoya temyîzê ya van jî berdewam e. Bi giştî di çarçoveya HAGB'ê de taloq kirinên bi pênc salan hene. Pirê dozên li min hatine kirin ji aliyê zavayê Serokkomar Erdoğan, Berat Albayrak, kekê wî Serhat Albayrak û Grûpa Sabah- ATV Turkvazê ve hatine kirin. Parêzerê van dozan jî Ahmet Özel e. Li gor nûçeyên di çapemeniyê de derketine, Ahmet Özel di Dadgeha Çağlayanê ya Stenbolê de kesekî bi bandor e. Serekê Grûpa Stenbolê ya di darazê de wek Grûpa Pelîkanê dihat binavkirin.

Qinyata min ew e ku di doza min de rasterast bi tesîr bûye û di cezakirina min de rolekî sereke lîstiyê. Ez bi cezayekî pir giran ê bi neheqî, nehuqûqî û bênîsbet; bi 7 sal û 6 mehan hatim ceza kirin. Îspata vê yekê jî lêpîrsîn û dozên dozên heqaretê li Serokkomar ên di biryara bi hincet de ne. Min ji pirê dosyeya berat kir bi tenê ji yekê 11 meh ceza girt û ew jî li temyîzê bû. Di kunyeya rojnameyê de navê min hebû. Li gelek kesên navê me bi hev re di kunyeyê de bû û pirê hevalên min ên xebatê tu lêpîrsîn nehatin kirin, tev ji der ve azad in. Nexwe biryara di vî barî de were dayîn nayê qebûl kirin.

Ez bêşûc im; zû ya dereng dê derbikeve meydanê. Ez ji Dadgeha Destûra Bingehîn û DMME'yê bi hêvî me. Lê hêj jî serlêdana min a li Dadgeha Destûra Bingehîn nehatiye guftûgo kirin. Meha 45an a cezayê xwe yê mirov herî 55 meh û 15 rojan radize. Di rewşa heyî de tevî ku sûdê ji serbestiya bi venihêrîn werdigirim ji qedandina cezayê min re maye 11 meh. Ez ê 15ê Cotmeha 2022yan bikarim tehliye bibim. Dadgeha Destûra Bingeh ji bo guftûgo kirinê li hêviya çiyê? Ez dixwazim ku Dadgeh zûzûka dosyeya min guftûgo bike, di vî barî de min piştgiiriya we divê.

2-) A duduyan, wek ku min li jor jî diyar kir, nêzikê 8 sal in bi dozên çapemeniyê yên ji ber nûçe û nivîsên quncikên li min hatine kirin re mijûl dibim. Min ji pirê wan berat kir, lê Daîreya Cezayan a 19emîn a Dadgeha Bilind biryarên beratê yên azadîparêz di eleyhê min de xera dike. Ne bi tenê ji bo min lê ji bo çapemeniya mixelef tevî rîsk e. Helwesta ve daîreyê û heyeta wê ya ji bo azadiya çapemeniyê û ya xwederbirinê divê ji aliyê gel ve were zanîn. Divê mirov zextan di vê saziyê rabike.

Li gor jînenîgariya Hevserokê Giştî yê HDP'ê yê berê Selahattin Demirtaş a di pirtûka xwe ya Leylanê de, 120 doz hene di der heqê wî de û hezar û du sed parêzer parastina wî dikin. Sed dozên min hene û bi tenê parêzerek min heye. Parêzerên rojnameyê ez ezl kirim, mam bi tena serê xwe. Bila cîrana min a parêzer Gokçen Şaşar Beş sax be, ji 15ê Tîrmeha sala 2016an ve bi min re dibe alîkar. Nêzikê çar salan e di girtîgehê de me. Tu hatineke min nîn e. Hevsera min kebanîya malê ye, çar zarokên min hene, sisê jê dixwînin. Xaniyê min kirê ye. Bi rewşa xwe ya nebaş a pereyî hewilê didim ku serî bi dozên di der barê xwe de serî derbixim. Ez û parêzera xwe têr hev û din nabînin. Ji ber ku dûrê Stenbolê me nikare were. Nikarim amadekariya parastina xwe bikim. 45 meh in ku ji Stenbolê dûr im. Piştî ku bi 6 mehan di girtîgeha F ya Edîrneyê de mam, tevî ku min nedixwest ez sewqê Girtîgeha L ya Balikesîrê hatim kirin. Ji 12ê Îlona 2018an ve 39 meh in li Balikesîrê me. Ji meha Adarê ya 2019an ve du sal û niv in ku daxwaza min a sewq bûyîna girtîgehên Sîlvîriyê yên li Stenbolê her meh hat red kirin. Di vê mijarê de zêde mexdûr bûme. Duçarê nehuqûqiyên neheqî û nehuqûqî me.

3-) Ji pirsgirêkên herî giring yek jê jî betal bûyîna daxwaza sewq bûyîna girtîgehê ye. Li Stenbolê çêbûme, bi salan li vî bajarî jiyame, li Stenbolê xebitîme, mala min, malbata min, dadgeha ez lê hatim darizandin tev li Stenbolê bûn. Tevî van yekan 45 meh in ku di girtîgeheke li derveyê Stenbolê dihêmin girtin. Ji ber ku malbata min dûrê min e têr nikare were serdana min. Ev rewş derûniya me bi nehênî bi bandor dike. Ji meha Adarê ya 2019an ve her meh min daxwaznameya neqil bûyîna nivîsî. Her tim bi hinceta 'kapasîte tije ye' tê red kirin. Lê belê niha li Sîlvîriyê qawîşên ji yên kêmtir kes tê de hene. Tevî van yekan mahniyên ku dikin bêwate ne. Malbata min ji bo serdanê bi madî zehmetiyê dikişîne. Bi rê de xetereya qezaya trafikê heye. Ev tev derûniya min mehf dikin. Li Stenbolê hatim binçav kirin, cihê ku dê min bişînin ji ber ku li derveyê Stenbolê hatim binçav kirin nêzikê çar salan e dûrê bajarê xwe tîm girtin. Ev helwesteke, ne bi heqî û huqûqî ye. Bînpêkirina maf e. Daxwaza neqil bûyîna min a Îlona 2021î ya dawîntirîn jî hat red kirin. Di serî de daxwaza min a neqil bûyîna Girtîgeha F ya bi Ewlehiya Zêde ya bi Hejmar 9 a Sîlvîriyê ya Stenbolê heta bi hejmar 1 a F yê, ji wir heta bi ya hejmar bi 8an (Di serî de Girtîgeha L ya Sîlvîriyê, Girtîgeha bi hejmar 1, 2 û 3 ya L yê li Maltepeyê û girtîgehên Tekirdağ û F û T ya Kandiraya Îzmîtê li gel min nêzikê 15-20 caran daxwaz kir hat red kirin. Der û dora Stenbolê min got bila Girtîgeha T ya Akhîsar a dê û bavê min lê dijîn be nivîsî, ew der jî hat red kirin. Biryarên bînpêkirinên mafî yên DMME'yê di vê mijarê de dane hene. DMME'yê Tirkiye mehkûmê tezmînatê kir. Dîsa jî kirinên bi neheqî berdeyam in. Ez dixwazim daxwaza min a neqil bûyîna demildest bi cih bihê anîn. Ez ji we tika dikim ku di vê mijarê de bibin piştgir.

4-) Tidarekên Pandemi/Koronavîrusê û sînardarkirinên wê herî pir bandor li me girtiyan û malbatên me kir. Di girtîgehê de em di girtîgeheke din de ne. Li Tirkiyeyê tevî tidarek û sînardar kirin hatin hilanîn, dibistan û navendên dayîn û standinê vebûn. Federasyon di maçên fûtbolê de trîbunan bi tevahî vedikin. Lê, tidarekên û sînardarkirinên di girtîgehan de ji meha Adara 2020î ku dest pê bûye hêj jî wek xwe berdeyam in. Em hatin ji bîr kirin!

Ji meha Adarê ya sala 2020î ve em nikarin hevdîtînên vekirî bikin. Nikarim dest bidim hevser, zarok, dê û bavê xwe. Nikarim wan hembêz bikim, wan maç bikim û bêhn bikim. 630 roj in, nêzîkê du salan e em bi vê êş û azarê re rû bi rû ne. Ên ku aşiyên xwe kirine divê bikarin hev û din bi awayekî vekirî hevdîtînê bidin kirin. Em rû bi rûyê eybeke giran a li dijê mirovahiyê ne. Qedexe bi tevahî bi awayekî bi kêfî berdewam e.

Bi mehan e, mehê du caran, bi tenê du kes dikarin hevdîtina bi awayê girtî bikin. Rêya vê sepandina ne bi heqî û huqûqî ku bihê nerm kirin heye. Hefteyê carekê mehê çar caran hevdîtina bi awayê girtî dibe ku were kirin. Sînardarkirina bi kesan jî bêwate ye. Hevsera min, çar zarokên min, dê û bavê min hene. Malbata min ji Stenbolê dihê, du kes diçin dîtînê, sê kes ji der ve disekinin. Em perîşan dibin. Hejmara kesan jî divê bihê zêde kirin. Di çûyîna revîr, bijîşk û nexweşxaneyê de tengav dibin. Ji xeynê rîska jiyani revîr- nexweşxane ne mimkûn in. Di qawîşê kes hebûn bi ku rojan dinaliyan. Tengasiya me ya xwe gihandina dermanan heye.

Di pandemiyê de bi mehan em nebirin sehaya werzîşê û salona girtî ya werzîşê. Sepandineke bi tevahî kêfî ye. Du meh in ku dest bi birina me ya sehaya vekirî kirine mehê du caran. Lê dibe ku hefteyê carekê bibe. Tu rîska wê nîn e.

Em rojnameyan rojek bi derengî dikarin bixwînin. Çima li vê tidarekê tê dewam kirin ez nizanim. Bi ya min tu rîska wê nîn e.

5-) Yasa û rêzîknameyên ku meclîsê derxistine lê nayên bi cih anîn hene. Ji rojevên herî giring ên girtiyên di girtîgehan de ev e. Yek jê serrastkirineke ku di cezayê de ji deha yek bihê anîn e. Serrastkirina yasayî bi serrastkirina înfazê ya Avrêla 2020î bû yasa hat kirin. Lê Rêbendana 2021î dê dest bi sepandinê bibûya. Rêzîkname jî hat weşandin. Lê tevî ku 11 meh di ser re buhurîne nayê bi cih anîn. Pandemi wek hincetê tê nîşan dayîn. Bo mînak, yekî ku cezayê wî 7 sal û şeş meh bin, yanî ji dehan yekê 55 mehan, dê 5 meh û nîv zûtir ji girtîgehê derbikeve, ji lewma dê bikare tehliye bibe. Lê mixabin ev yek niha li tu girtîgehê nahê bi cih anîn. Heger ku dê nehê bi cih anîn çima dihê derxistin!

Serrastkirina duyemîn a yasayê wê derketiye lê nahê sepandin, dema hevdîtina li girtîgehan ji seetekê derxistina seet û nîvê ye. Di Xezîrana 2021î de, li meclîsê hêj nebû betlane derket lê hêj jî nahê sepandin. Hêj jî em dikarin bi tenê 45 deqîqeyan hev û din bibînin.

Pirsgirêk, neheqî û nehuqûqiyên sereke yên li min bûne ev in...

Ez dikarim hêj gelek tiştan binivîsim, lê naxwazim zêde dirêj bikim.

Spas ji bo eleqeya we, serkeftin ji we re. Hez û silav li we...

Îbrahîm Karakaş

Xebatkarê Rojnameya Yeni Yaşamê

(Girtîgeha F ya Girtî ya Edeneyê - Nameya 20ê Îlona sala 2020î)

(.....) Hevalên ezîz, ez û gelek hevalên xwe ji ber vê têkoşîna bi rûmet û nûçeyên nehatine bihîstin û dîtîn ji ber ku me bi gel daye zanîn bi hincetên cur bi cur, bi nebûyiyên li me hatine kirin em di girtîgehan de ne. Ji ber ku li kevneşopiya Çapemeniya Azad a me ji bi dehan hevalên xwe yên qehreman wek mîrat girtiye û dewam dikin, dixwazin me biçewîşînin û ker bikin. Lê ji berê heta bi niha wek şopîner û mîraxwirê hevalên bi dayîna canê xwe di vê rêyê de li ber xwe dane bêyî dana tawîzan ji bo van zextan li kû dibe bila bibe, me ji vê xebat û helwesta xwe ya bi rûmet tu tawîz nedan. Heta ji milên milên bihê, rojekê ne têr be jî me hewil daye ku bibin liyaqê van berdêlan. Wan tu car nekariya serî bi kedkarên çapemeniyê azad bidin tewandin, wan ker bikin û dê nekarin wan ker bikin. Em li kû bin jî, di her şert û mercî de em ê ji vê helwesta xwe tawîzê nedin û her û her bibin bibin dengê wijdanê kesan.

Hevalên hêja, wek ku hûn dişopînin merheleyên darizandina me berdewam in. Em û hevalên xwe yên rojnamevan ji ber xebata xwe ya rojnamevaniyê bi fezlekeyên şapînoz û îdianameyên berpêkirî didarizînin û me bi dehan salan ceza dikin. Di îdianameyên me de nûçeyên ku me çêkirine, kirinên me yên çapemenî û weşandinê bi awayekî ji rastiya xwe qutkirî pê de dikevin û bi sûcdar kirinên cihê bi cihê dikin mijara darizandinê. Hûn jî dizanin ku ev rewş herî dawî li ser darizandina min bi pêj de hat birin, rastî hat berovajî kirin û kirin mijara sûcdar kirinên cuda. Çalakiyên me yên çapemenî û weşandinê kirine mijara sûcdar kirinên cur bi cur ên îdianameyên li me hatine kirin. Çalakiyên û hevalên min ên rojnamevanên ên din sûcên wek "çalakiya rêxistinî", "fînanse kirin", "peyda kirina kesan", "teşwîq kirina kîn û ser-

hildanê” sûcdar kirine. Em di temamê parastinên xwe de û bi helwesta xwe ya di merheleya darizandinê de li van xebatên xwe bûne xwedî, me helwesta xwe ya qêrîna rastiyan parastiyê. Ji lewma ye ku kirinên me wek “endamtiya rêxistinê”, “birêvebirina rêxistinê” îfade dikin û li me her yekî bi dehan sal ceza dibirin. Em duh çawa ji dayîna berdêlan nereviyabin em ê îro jî jê nerevin û em ê tu car xwe ker nekin û em bi bawerî ne ku em ê bi ser bikevin. Bi fizîkî em dîl bin jî fikr û pêûsên me dê her azad bin.

Hevalên ezîz, ji cihê ku em lê ne carinan dibin tevkar û hewil didin ku bibin dengê vê derê û dengê xwe bidin bihîstin. Bi nûçeyên xwe yên ku em dişînin derve tevkarîyê dikin. Lê wek ku tê zanîn girtîgeha em tê de û di girtîgehan tevan de rewşa me tecrîda di nav tecrîdê de ye. Mafên me yên sînorkirî yên ji berê de mayî bi nîşandana wek hincet a sînordar kirinên pandemiyê em ji temamê kirinên xwe bêpar dihên hiştin. Em nikarin sûdê ji çalakîyên jiyana civakî werbigirin. Bi hinceta pandemiyê kirin û çalakîyên me yên wek suhbet, werzîş, atolye, kurs û wd. tev tîn asteng kirin. Em ji van mafên xwe û gelekên din bêpar dihên hiştin. Hevdîtina vekirî ya mafê me yê hevdîtina mehê bi sê caran mehê du caran bi awayê ku ji 4-50 deqîqeyan nebuhure didin kirin. Mafê hevdîtina bi seet û niv bi meriyet bûye û di girtîgehên din de dihê sepandin, bi hinceta “şertên girtîgehê û netêrbûyîna karmendan” hêj jî bi 45-50 deqîqeyan sînordar dihêlin. Serlêdanên huqûqî yên me di vî barî de kirine ya bê bersiv dihêlin, ya ji dihêlin ji înisyatifa rêvebirîya girtîgehê re. Hevdîtin girtî û yên em bi telefonê bi malbata xwe re dikin bi awayekî nehuqûqî qeyd dikin û dikin mijara sûcdar kirinên cur bi cur. Serlêdanên huqûqî yên me ji bo van û kirinên bi vî awayî kirine hêj nehatine bersivandin. Tevî ku girtî du caran aşî bûne û tu temasa wan bi derve re nîn e, bi hinceta pandemiyê em ji temamê mafên xwe bêpar tîn hiştin. Di sazî û destgehên cemaweriyê tevan de, di sektora taybet de, di warên din ên jiyane de sînordarkirinen pandemiyê yên hatine sist kirin bi tu awayî di girtîgehan de nayê kirin.

(.....) Hevalên ezîz, mijareke din jî ew e ku bi kirinên hatin serrast kirin û girtî di mijara çapemenî û weşandinê de rû bi rûyê tengasiyên bi cidî dibin. Weşanên em dixwazin naînin. Ji ber ku rojnameya Yeni Yaşam û Evrensel ne di nav saziya çapemeniyê ya ragihandinê de ne nadin me. Kovar û pirtûkên em dixwazin bi hinceta biryara berhev kirina wan heye nadin me. Dest didin ser nûçeyên hevpişeyên me ji der ve dişînin, nivîsên quncikan û gotarên rojnameyên em ji wan re dixebitin. Herî dawî dest dan ser gotar, nivîsên quncikan, nûçe nivîs, helbest û hwd. ên di rojname û ajansan de derketin bi hinceta ‘bi teksîr in.’ Nivîsên berê dihatin jî nêzîkê 15-rojan di bin navê vekolînê de bi derengî hatin dayîn. Ji bo kirina rojnamevaniyê di girtîgehê ji bo dosyeyên ez ê di mijarên cur bi cur de amade bikim hewcedariya min bi gotar û nûçeyên kevin ên hatibûn nivîsîn û çêkirin hebû. Dest dan ser, nêdan me. Bi kirinên wiha dixwazin çalakîyên me yên rojnamevaniyê asteng bikin. Helbet em ê bi asteng kirinên wiha dev ji kirinên xwe ji bo bibin dengê girtîyan bernedin. Di çî şert û mercî de dibe bila bibe, em ê li vê têkoşîna ji bi dehan şehîdên me yên çapemeniyê yên qehreman mîrat maye dewam bikin, em ê girêdayê bi biranîn û doza wan ve, cardin soza pêk anîna xeyalên wan didin.

Hevalên delal, bi vî awayî nameya xwe bi dawî dikim, spas ji bo piştevaniya we û silav li we tevan, ji ber xebatên wan serkeftin ji bo kedkaren çapemeniya azad tevan.

Kenan Karavil

Gerîndeyê Weşanê yê Giştî yê Radyo Dunyayê (Girtîgeha T ya Bûrhanîyeyê Balikesîrê - Nameya 8ê Mijdara 221î)

(.....)

Nameya hinek bi derengî gihîşt ber destê min. Lê min bêyî buhurîna zêde ji demê hewil didim ku bibim bersiv, hêvîdar im ku bi lez û bez bigihîje ber destên we. Çimkî jixwe dereng dihê ber destên me. Bo mînak; nameya we piştî 25 rojan gihîşt ber destên min, li gor hesabê roja we name şandiye dibêjim.

Hevalên hêja, di nameya ku we şandiye de we diyar kiriye ku we komeleya xwe di meha Rêvandanê ya 2020î de ava kiriye. Sala duduyan ava bûyîna komeleyê nêz dibe, ji wê boneyê ez dibêjim ku bil li we xebatkarên KRDFê bi xêr be. Hûn pê ilam in di van salên dawîn de gelek rojnameyan bi yasayên dawîn nadin girtîgehan. Ji lewma haya me ji gelek tiştan çênabe. Bi nameyên ku em ji dost û hevalan digirin haya me ji tiştan çêdibe. Ew jî ji ber ku bi derengî ne tu rojaneyîya xwe namînin. (.....)

(.....) Ez sala 1980yî li Qosera Mêrdînê çêbûme. Ber bi dawiya sala 1989an ji ber sedemên aborî û vala kirina gundan em neçar mane ku koçê Edeneyê bikim. Malbata min hêj li Edeneyê ye. Bi xebata demeke kin di Ozgur Halkê û di 1997an de di Azadiya Welat de pêşî Edene bi dûv re sala 1999an li Mêrsînê dest bi rojnamevaniyê kir. Ber bi serê sala 2000î ez hatim binçav kirin. 4ê Avrêla 2000î min 15 sal ceza girt. Sala 2005an di çarçoveya serrastkirineke yasayî ya di Qanûnên Komara Tirkîyeyê de ez 2yê Adara 2005an hatim berdan. Ji sala 2005an heta bi 2007an ez di sazgehên yasayî de xebitîm. Di vê demê de ji ber beşdarbûyîna çalakiyan bi sê caran ez her carê sê meh heps razam. Mehên ewil ên sala 2007an hatim derketim ji girtîgehê. Paşê min Radyo Dunya ya li Edeneyê weşana xwecihî dikir de dest bi xebatê kir. Heta ku dest bi girtinên KCK'ê bê kirin jî ez di radyoyê de xebitîm.

Gava ez hatim girti gerîndeyê giştî yê Radyo Dünyayê bûm. Radyo Dünya bi biryarnamê sala 2016an derketin hat girtin, ez bibêjim dest dan ser çêtir e. Jixwe hingê gelek radyo, rojname û tv hatin girtin, hin ji wan cardin vebûn hin jê hêj jî girtî ne. 11ê Berfanbara 2009an ez tevî hevalê xwe yê rojnamevan Seyitha Akyüz (Azadiya Welat) em 3 kes hatin binçav kirin. Nêzîkê 15 kes ji me girtin û şandin girtîgehê. Îdianameya me salek bi şûn de hat amade kirin. Gava îdianameya me hat em hîn bûn ku em ji endamtiya rêxistinê dihên sûcdar kirin. Yanî bi kurtasî xebatên ku me salên 2007-2009an di radyoyê de kirine, vekirina buroyên hîlbijartinê ku min bi armanca çêkirina nûçeyan şopandiye, çêkirina nûçeyan bi beşdarbûyîna çalakiyên sazî û destgehên cur bi cur wek delîl xistine nav dosyeya min. Ev ne bes, îcar wek ku ji sala 2007an heta bi 2009an sê caran bûbim endamê rêxistinê û heta niha min sê caran ji endamtiya rêxistinê ceza girtibe li min hatiye kirin. Ez kitekitên dosyeyên xwe li jêr dinivîsim.

1. Dosyeya min a ewil: Doza KCK'ê ya sala 2009an 13 sal û 6 meh. Hejmara Dosyeyê: 2010/669 Di dosyeyê de me xwest em bi zimanê xwe yê zikmakî parastina xwe bikin lê nehat pejirandin. Bêyî kirina parastina xwe sala 2012an min ceza girt û ceza ji aliyê Dadgeha Bilind ve hat erê kirin.

2. Dosyeya min a duduyan; kesek (nas nakim) di der barê min de îfade daye Midûriyeta Ewlehiyê, li ser îfadeyên wî (Hejmara dosyeyê: 2012/ 642 Hejmara Biryarê ya Asas: 2012/704) 6 sal û sê meh) Tevî îtirazên ku min kirin tevan cezayê min ji aliyê Dadgeha Bilind ve hat erê kirin. Cezayê min bi temamî bû 19 sal û 9 meh.

3. Dosyeya min a sisêyan jî hêj li Dadgeha Îstinafê berdewam e. Hejmara dosyeyê: 2014/191 asas. Ji wê jî min 6 sal û sê meh ceza girt. Ev jî bi dosyeyên min ên min li jor nivîsîne û xebatên min çapemenî û weşandinê yê di heman heyamê de kirine. Ev jî wek dosyeyê KCK'ê nat lê dihê kirin. Ji bo vê dosyeyê hem bi daxwaznameya herî berfireh a dawîn bi rêya parêzerê xwe serî li hin sazî û destgehan û Dadgeha Îstinafê da. Min nivîsî ku ne mimkûn e ku mirovek di heman demê sê caran bibe endamê rêxistinê û ceza kirin ji endamtiya rêxistina bi sê caran nehuqûqî ye. Ji bo zêde wextê we negirim temamê daxwaznameyê nanivîsim, heger bivê hûn bi rêya parêzerê min dikarin peyda bikin. Ev dosyeya ji sala 2008an ve berdewam e. Propaganda ji ber buhurîna qewl di ser re, ket. Ji vê dosyeyê 9ê Berfanbara 2019an ji aliye Dadgeha Cezayên Giran a 5emîn a Edeneyê ve hatim ceza kirin û hêj li Dadgeha Îstinafê berdewam e. Ev jî were erê kirin cezayê min tev tevê hev dibe 26 sal.

4. Du cezayên berê yê min ji propagandayê girtibûn jî bi yasayên sala 2012an derketin, taloq bûn. Ji xwe her yek jê 10 meh bû.

Hevalên hêja, sala 2009an ku hatim girtim heta bi niha, salên 2009-2012an li Fya Kurçulerê, 2013-2016 li Girtîgeha Kirikkaleyê, ji sala 2016an heta bi niha jî li girtîgeha ku tê de me. Pirsgirekên em rû bi rû ne hema bibêje yek in. Mînakên herî berbiçav ên vê yekê ew in ku bêyî daxwaza min pêşî ez sirgûnê Kirikkaleyê hatim kirin û bi dûv re jî sirgûnê hatim kirin. Cihê min 16 seetan dûrê malbata min e, malbata hin hevalan li Wanê ye û rewşa malbatên me dihê zanîn, ev zilma li me dihê kirin li malbatên me jî dihê kirin. Tu dibê qey ji dayîkên me hesabê çima wan em çêkirine dipirsin. Pir kes ji me di girtîgehê de bûn dê û bavê wan canê xwe ji dest dan. Tevî ku yasa heye bi hinceta ewlehiyê nahêlin em di rêwîtiya dawîn a wan de bi wan re bin. Ev a ku dihê kirin, ne zilma herî mezin e lê çi ye? Bûyereke bi vî awayî bi serê min de nehatiye lê li gelek hevalên min wisa bûye. Ji xwe bi hindikahî be jî rewşên wiha di çapemeniyê de derketin. Heger her tişt wiha berdewam bibe tu wateya aşiyê jî namîne. Heta meha çûyî du odayên me em li heman korîdorê diman lê niha her odayeke me li korîdorên din e.

Hevalên hêja, niha jî em di dema COVID-19'ê de ne. (.....) Suhbet (di nav odayand de) beriya COVID 19'ê em derdiketin, me dikirin, hevdiandin me bi vekirî bi malbatên xwe re dikirin hatin hilanîn. Werzişa me dikir jî ji xeynê sê mehên dawîn hatin hilanîn. Werzişa em her hefte derdiketin, niha bi tenê mehê du caran em dikarin derbikevin. Ji ser navê asayî bûyîne ji der ve tu tidarek nîn in. Lê di girtîgehê ha vê mehê, ha meha bihê behs bi asayî bûyîne dibe û pêvajoya dirêj dibe. Ji vê yekê, xebatkarên girtîgehê jî di nav de her kes gilî û gazine xwe

dike. Girtîgeh tev cara duduyan jî aşî bû, roja duşemiyê ku dê ev name bi rê bikeve jî em ê cara sisêyan aşî bibin.

Li ser hev pakêt derdikevin, niha jî dihê gotin ku dê pakêta 5an derbikeve. Bi her pakêti re gelek sînardarkirinan tînin ji bo me girtiyan. Herî dawî yasayek derxistin, gotin dibe ku ji girtiyan re diyarî werin şandin, ji bo vê yekê hat gotin ku divê diyarî bi tenê pirtûk bin. Berê çî pirtûkên dihatin didan, niha jî pirtûkên wek diyarî dihên bi mehan nadin; wek pirtûkên di mehên cot û fer de dihên sînardarkirine. Nihêrtina lê jî hesab bikî derketina ji navê yekcar zehmet dibe. Encama îtirazên me ji bo yasayên dertên tu nîn e, anku nayên pejirandin. Gava em bi rêvebiran re diaxivin, dibêjin “yasa ye, tiştêkî em bikin nîn e.”

Tevî van tiştên dihên kirin helbet hêvîdar im. Piştî tengasiyê ferehî ye. Ew qas salên buhurîn tu tişt ji min kêr nekirin. Ez bi fizîkî li cihekî ji we dûr dihê girtin lê bi fikir û raman azad im. Pirê dema xwe bi xwendinê derbas dikim. Pirê xwendina min li ser dîrokê ye. Ji xeynî êşa ser bi tenduristî ez baş im. Pirsgirêkên min ên tenduristiyê yên bi cidî nîn in lê mîmariya zindanê bixwe dibe sedema nexweşiyên. Nexweşiyên kronîk ên gelek hevalan hene. Tedawî bi tenê bi dermanan dibe, ev jî ji çareseriyêke bi mayînde bêhtir demkî ye.

Dixwazim pirsgirêkeke ez- em rû bir û ne binivîsim. Hevalên di girtîgehê de mabin hebin dizanin; li gor Wezareta dadê di yasayê de heye ku ji xeynî girtî yên ewil mirov dikare navê sê kesên din jî binivîse ji bo hevdîtînê. Ez jî gava hatim Bûrhaniyeyê min navê sê kesan nivîsî. Min navê dayîkeke 60-65 salî û hevalekî xwe yê ji girtîgeha ez tê de me derket nivîsîn. Keysa wan çêbibûya yek carinan dihatin dîtina min. Sala 2021ê ez pê hisiyam ku ev dayîk û heval hatine binçav kirin, sedem jî ew e ku çîma tu xizmtiya me nîn e lê çîma tîna dîtina min.

Çîma alav û amûr û pere radizînin hesabê min. Ew çar roj di bin çavan de hiştine. Bi yasayî mafekî wiha heye, lê ji bo ku em sûdê jê wernegirin tiştê ji milên wan tê dikin. Li dereke din kirineke bi vî rengî heye yan na nizamim lê bi îhtimaleke mezin heye û di çapemeniyê de derketiye.

Bi hêviya dîtina hev û din sibêrojeke azad û demeke ku çapemenî neyê sansor kirin! Em pê dizanin ku ew roj nêz in. (.....)

Nedîm Turfent

**Nûçegihanê Ajansa Nûçeyan Dicle
(Girtîgeha Wanê - Nameya 17ê Cotmeha 2021î)**

Wek ku hûn dizanin pênc sal û nîv in ku ez girtî me. Di girtîgehê de wext zû derbas nabe. Şêrtên girtîgehên li welêt li ber çavan in. Bi pandemiyê re tidarekên hatin kirin û sînardarkirîn bûn destpêka îzolasyoneke riid. Me digot qey em aşîya xwe bibin dê asayî bûyîn hêdî hêdî dest pê bibe. Lê di vê mijarê bipêjdecûyîn pir hêdî ye. Çalakiyên civakî-çandî, kurs, suhbet û wd. hêj sînardarkirî ne. Yanê em sûdê jê nagirin. Serdan bi awayê vekirî nîn in, mehê du caran mafê serdana bi girtî ya ji bo du kesan heye. Ji xeynî wê şev û rojên me bi du kesên di qawîşan de dibuhurin. Ji xwe têra xwe em ji civakê bi mesafe ne!

Di darizandina min bi lez û bez hat kirin de aşkere bû mafên min hatin binpêkirin. Tu lêkolîn-vekolîn nehatin kirin, bi ser de daxwazên min tev hatin red kirin. Şahidên derketin hizûra dadgehê tevan beyan kir ku wan îfadeyên xwe di bin êşkenceyê de dane. Îfade pûç bûn îcar man par kirinên medyaya civakî di dosyeyê de bi naviroka xwe bi tenê nûçe ne. Guh nedan parastina min, wergêrê peyda kirin bixwe got ku ew têr bi Kurdî nizane. Ya ji her tiştî girîngtir ew e ku ez yek carekê jî bi fizîkî dernexistime hemberê dadgêr. Dadgehên raser, vê wek binpêkirineke mafî ya beloq dibînin, ji xwe biryarên mînak jî hene. Dosyeya ku rêya wê hebû bibûya propaganda di endamtiya giran bi encam bû. Aliyê herî komîk jî di biryara bi hincet a heyeta dadgehê de derket; “Ji ber nûçeyên mirov nerehet dike çêkirine...”

A rast ev lixwemikurhatina her tiştî ye. Piştî biryarê pêvajoya îtirazê dest pê bû. Hingê wek ku di biryara Dadgeha Destûra Bingehîn a di der barê Akademîsyenên Aştiyê de çêbû, li xala têkildar a TMK'ê îfadeya “îfadeyên bi armanca çêkirina nûçeyan mirov aciz jî bikin nabin sûc.” Gelek mînakên bi vî rengî hene. Lê mixabin Dadgeha Bilind ev yek di dosyeya min de neseband. Di pêvajoyeke wiha ya ku Dadgeha Bilind çavên xwe digirtin, xwe ker dikir, xwe li nezaniyê datanî, Mehdî Ekerê AKP'yî di bernameyêke televizyonê de got ku di operasyonên li bajaran de hêzeke bê nisbet hatiye bikaranîn û ev yek kir sûcê FETO'yê. Nûçeyên min jî bi vî awayî di vî barî de bûn. Di der barê binpêkirina mafan û bikaranîna hêza bêhevsengî...

Me hem serî li Dadgeha Destûra bingehîn hem jî li DMME'yê da. Lê, ji ber ku wek yekî hukumxwarî dihê mîjara lezahiya dozê de dibe dezavantaj. Her duyan jî dosye ji xwe re nekir rojev. Ew qas bînpêkirinên aşkere hene di dosyeyê de, divê bi dosyeyê re mijûl bibûna. Di vê mijarê de sazî û destgehên azadiya xwederbirin û çapemeniyê û rojnamevaniyê yê navneteweyî dikarî rolekî bêhtir aktîv bigirta. Dikarin vê yekê wek rexneyekê bibînin. A rast, gava rojnamevanek li Stenbolê dihê girtin û li herêmê dixebite dihê girtin di rojêva di der barê rojnamevan de çêdibe cudahiyeke pir zêde çêdibe. Bo mînak ev yek niha li welêt hema bibêje hîç nabe rojev. Çimkî li Stenbolê rojeveke wiha nîn e. Ji mirov be mirov li Stenbolê were girtin!

Ji ketina bin salekê ya cezayê min re demeke kin maye. Di 29ê Mijdarê de dê bikeve bin salekê. Em ê 29ê Mijdarê serlêdana xwe ji bo veqetîn û serbestiya bi şert û merc li girtîgehê bikin. Te dît, ji edaleta bi derengî be ne edalet e dihê gotin, lê êdî edaleta bi derengî jî bihê xuya nake. Qet nebe divê mirov mafê xwe yê serbestiya bi şert û merê sala dawîn bigire. Lê di vê mijarê de di navbira girtîgehan de sepandin cuda ne. Hin girtîgeh berdidin, lê hin jê jî hiştina di girtîgehê de tercîh dikin. Bi yasayê serê salê derket yê berdana wan 'gunca' nabînin 6 mehan taloq dikin. Cezayê dadgeh dide yek be jî, qewlê di girtîgehê de tê derbas kirin cuda dibe. Di vê mijarê de divê wezaret kirineke Standard bîne. Spas ji bo piştgirî û hestewariya we, serkeftin ji we re.

Bila hibra pênuşa wê serbest biherike...

Ozlem Seyhan

Edîtora Jinnewsê

(Girtîgeha Jinan a Amedê – Nameya 8ê Mijdara 2021î)

(.....)

Em wek rojnamevan me hay jê heye ku rojnamevanî li vî welatî her dem bi zor, bi êş û hewil û azîneya têkoşînê dibuhure. Ez dibê m qey li tu dera dinyayê tabloyeke wiha nîn e. Kirina qala rewşa di girtîgehê de carinan zor e, mirov nizane dê pêşîtiyê bide çî. Rojane, bi awayekî sistematîk ewqas kirinên kefî hene ku mirov nizanê de kîjanî binivîse. Bi kurtasî be jî hin xusûsên ez, em rû bi rû mane hewil bidim ku binivîsim.

Li girtîgehan şertên jiyane sînorkirî ne, maf dihên bînpê kirin. Ji ber azadiya fikr û raman bi hezaran mirov di girtîgehan de ne. Ez dixwazim hûn bizanin ku mafê me yê azadiya xwendin û nivîsînê hewil didin ku ji me bistînin. Çalakiya sereke ya girtîgehan xwendina pirtûkan e. Karê rewnak bûyînê, çêkirina azadiya azadiyê hişmendiyê û jiyaneke bi wate ye. Mixabin kotaya pirtûkan a didin her girtiyekî bînpêkirineke mafê girtiyan e. Bi tenê dikarî 10 pirtûkan li bal xwe bigirî. Xetereya girtina pirtûkan li bal xwe kî çiqas bixwaze çî ye nizanîm. Di pirtûkxaneyên girtîgehan de peyde kirina pirtûkan zehmet e. Daxwaza me ya asas ew e ku kotaya pirtûkan were hilanîn. Nabe ku pêşîya rewnak bûyîna hişmendiyê were girtin. Em dixwazin ku kirinên kefî ji navê rabîbin.

Di demeke nêzik de hem girtîgeha em tê de hem di girtîgehan din de ji bo name û xebatên bi Kurdî dihên nivîsîn komîsyonên xwendina nameyan, pereyê wergerandinê dixwazin. Ji bo zimanên biyanî yê din pereyê ku nayê xwestin çima ji bo Kurdî tê xwestin. Ez rojnamevan im, ji hin hevalên xwe re nameyên bi Kurdî dinivîsim, bi kirinên wiha ji min re nikarin bibin astengî. Axavtina bi zimanê xwe mixabin hêj jî qedexe ye. Bi vî awayî mafê me yê ragihandinê dihê asteng kirin. A rast min ev nivîsa xwe dixwest ku bi Kurdî binivîsim, lê ji ber ku hêj jî nikarim ji ber vê yekê lêbuhurîna xwe dixwazim. Fikir bi çî zimanî bihê nivîsîn bila bihê nivîsîn nabe ku were asteng kirin, hêza fikrî qedexehiyar tevan perçe dike, divê mirov hay ji heqîqetê hebe. Wek jineke rojnamevan a Kurd ev rewş rewşeke xemgîner e.

Di girtîgehan de bi giştî girtî bi hişmendiyê mafên xwe yê huqûqî ji bo çareser kirina her pirsgirêkê serî li rêyên huqûqî didin. Dîtina parêzeran tîm me mimkûn e. Em girtî wek parêzeran dixebitin. Em serî li her derê didin. Lê çî îtiraza em dikin, serlêdana sûc bêbersiv dimîne û ya jî di eleyhê me de bi encam dibe. Bo mînak; serlêdanên em li dozgerên girtîgehan, serdozger, rêvebiriyên girtîgehan, girtîgeh, Saziya Venihêrînê, wezaretên cur bi cur û hwd. dikin bi vî halê xwe formalîte dimînin. Wek ku hûn jî dizanin berpirsiyariyên van sazîyan hene, di der barê bînpêkirina mafan ên diqewimin de divê tidarekan bikin, demajoyên cezayî bidin destpêkirin. Mixabin têkoşîna huqûqî ya dihê kirin jî pûç dikin.

Her wiha eleqeya sazî û destgehên civaka sîvil a ji bo girtîgehan û çareseriyên wan qels bin jî hin başkirinên demkî jî çêdibin, berdewam nabin. Di vê wateyê de em diyar dikin ku divê di warê bînpêkirinên mafî de sazîyên mafê mirovan û civaka sîvil bêhtir bixebitin.

Wek ku hûn jî dizanin pêvajoya pandemiyê bi pîrsgirêk û bi êş derbas bû. Bi taybetî di girtîgehan de gele bînpêkirinên mafî, rewşên ji mafê tenduristiyê re dibin astengî diqewimin. Em wek girtîgeha girtî ya jinan nêzikê 20 kes bi koronayê ketin. Hêj jî di der heqê em çawa bi vê vîrusê ketine tu agahdar kirinek nehatiye kirin. Ji xeynê personelên girtîgehê temasa me bi tu kesî re nîn e, di serî de me ji girtîgeh û wezaretê tenduristiyê re nivîsî lê me tu bersiv negirt. Bînpêkirineke cidî ya mafê tenduristiyê çebûye. Hevdîtin vekirî nayên kirin, hevdîtinên bi parêzeran re jî di pişt camê de dihê kirin. Aktîvîteyên hevpar nîn in, tam îzolasyonê heye. Ji der ve sînardar kirin rabûne, di girtîgehê de berdewam in. Ji bo guherîna vê rewşê demildest divê rayedar berpîrsiyariya xwe bi cih bînin.

Di girtîgehan de pêvajoya asayî bûyîne dest pê nebûye. Tevî ku aşî bûne, sînardarkirin berdewam in.

Di der barê vê rewşa cezayî de jî, ji bo dayîna wek agahî, min 8 sal 9 meh ceza girt. Cezayê min ev meh hat erê kirin, ez niha hukumxwarî me. (.....) Nêzikê çar sal in di girtîgehê de me. Pîrsgirêkên em rû bi rû ne dikarim di bin hin sernavan de wiha rabigihînim. (.....)

Pûlên ku we herî dawî şandin min hêj negirtine, çimkî mixabin em ji der ve nikarin pûlan bigirin. Careke din neşînin baş e.

Bimînin di xweşiyê de...

Sami Tunca

Midûrê Karê Nivîsê yê Kovara Mücadele Birliği (Girtîgeha F ya Bi Hejmar 1 a Tekirdağê – Nameya 25ê Cotmeha 2021î)

(.....)

Girtîgeh rastiya vî welatî ne... Kengî kesek fikrên xwe li dijî desthilatdariyê bibêje rû bi rûyê girtîgehan dibe. Helbestvan, nivîskar, rojnamevan û nîgarkêşên me... Ji vê rastiye her tim para xwe girtine. Ya rast li vî welatî nasîna rastiya girtîgehan siûdeke pir mezin e. Çimkî dibe ku mirov were kuştin jî ji ber. Heger rojnamevan bî, binivîsî mirin bi qasê deklanşora wênegirêkê nêz e. Di bîrên asîdê de ya di kuçeyekê dibe ku mirov were kuştin. Li welatekî bi xetereyên wiha tije rojnamevanî karê herî xeternak e.

Ën dihên girtin ji vî awayî ve bisiûd in. Û ew jî tevî her tiştî heger ji sekna xwe tawiz nedin qîmeta karê xwe didin. Ji ji bo dostên me yên ji der ve rewşeke pêvajoyeke zor e niha. Rojname dihên girtin. Rojnamevan êşkence dibin, binçav dibin û hêj rû bi rûyê gelek tiştan dibin. Dixwazin rastî veşarî bimînin, tu tişt di medyayê de xuya nebin. Li vî welatî encax feraseta çapemeniyê ya şoreşker hebe, dê hebûna dengê bindestan berdewam bibe. 8 sal in girtî me. Wisa xuya ye ku dê hêj demeke dirêj ji bidome girtî bûyîna min. Ez ê bi kurtasî ji we re behsa dosyeyên xwe bikim, jixwe ez ê wan jî ji we re bişînim. Hûn dikarin ji wir bişopînin.

Meha Îlonê ya sala 2013an bi şev girtin bi ser mala ez lê dimam û ez binçav kirim. Sedema binçav bûyîna min bûyereke di sala 2008an de 6 meh girtî mabûm ji ber. Ji vê dosyeyê 10 sal û 5 meh cezayê hepsê dan min. Helbet sûc çî ye mirov meraq dike. Sûcê min mayîna li ber dikana bavê xwe ye. Erê, li nuqteyekê sekinîme, paşê jî çûme mala xwe. Lê li gor Midûriyeta Ewlehiyê ya Dîlokê, heger em nehatana girtin me yê çalakîyê mezîna a bi nav û deng bikira. Tu delîlekî şênber nîn e. Şopandin, wêne, qeyda kamerayan nîn e. Polîs wek ku romaneke polîsiye binivîse dosyeyek amade kiriye û dadgehê jî biryar daye. Li Dîlokê ji bo asteng kirina xebatên hunera şoreşkerên Navenda Hunerê Ayaşîyê serî li tiştêkî wiha dan. Dadgeha Bilind ku erê kir demekê ez ji der ve mam, paşê jî hatim qefaltin.

Gava ez hatim girtin min digot qey mijar bi tenê ev e. Lê na, hemin ku ez hatime girtin, ji bo ez demeke dirêj bihêmin hiştin, di bin çavan de ez hîn bûm ku ji dosyeyê din biryara binçav bûyîna min heye. Mijar; rapêrîna Geziyê... Di vê mijarê de ez, di der barê rastiyekekê de ez dixwazim ji bo hevalên hêja li xwe mikur werim; rapêrîna Geziyê min daye dest pê kirin. Min got, na heyran ev rapêrîna bi milyonan kesan e. Lê 52 sal ceza dan min û Dadgeha Bilind bi lez û bez erê kir.

Di dosyeyê de gelek tiştên balkêş û komîk hene. Bo mînak, di malpera kovara Mücadele Birliği ya min midûriya karê nivîsê yê wê kiriye nûçeya ku ez binçav bûme û hatime girtin ha-

tiye çêkirin. Jixwe hingê di gelek weşanên çapemeniya şoreşker-demokrat de bûbû nûçe. Lê ji ber ku di malpera Mücadele Birliği de nûçe hat çêkirin Rêxistina Lenînîst/ Partiya Komunist a Kedê ya Tirkiyeyê li min bûbû xwedî. Ev yek jî delîleke bes bû ku ez bibim endamê rêxistinê.

Min cezayekî din ê ji endamtiya rêxistinê di asta herî jor de stand. Di malpera min midûrê karê nivîsê yê wê dikir nûçeyeke bi tenê ya di der barê min de encameke besê bûyîna endamê rêxistinê ye. Min ji meş, daxuyaniyên çapemeniyê, mitîng û hwd. ên wek rojnamevan şopandine tevan ji propagandaya rêxistinê ceza stand. Ne diyar e ku propagandaya kîjan rêxistinê ye. Diruşmên "Her der Teksîm her der berxwedan", "Sarigazî dê ji faşîzmê re bibe goristan" hatine berz kirin. Bi deh hezaran mirov ev diruşm berz kirin, lê yê ku di destê xwe de bi makîneya xwe ya wêneyan propagandaya rêxistinê kiriye. Lê kîjan rêxistin e ne diyar e.

(.....)

Bi van çûyîn û hatinan ez hîn bûm ku di der barê min de îdianameyên nû hene. Îcar ji ber ku midûrê karê nivîsê yê kovara Mücadele Birliği bûm doz li min hatin kirin. Biryara berhev kirinê hat dayîn. Çêkirina nûçeyê mirovên di qatên jêzeminan de li Kurdistanê hatin kuştin, gotina tiştên li wir qewimîne.

Sê salan di navbera Tekirdağ- Stenbolê de çûm û hatim. Bi rîngan çûyîna dadgehê, çûyîna ewqas rê zehmet e helbet. Lê di girtîgehê de dostekî mirov, dîtina hevalekî, bihîstina dengê wî bêhna mirov derdixe. Bi nivîskarên rojnameyê re em çûn Stenbole û hatin. 7 sal û 8 meh ceza dihê xwestin, niha li Dadgeha Bilind e.

Heval û hogirên hêja, ji we re dixwazim behsa şertên xwe bikim. Bi şertên pandemiyê re mafên me yên werzîş û suhbetê bi tevahî hatin asteng kirin, piştî bi mehan serdan hatin qedexeyê kirin dest bi hev dîtina ji mehê du hev dîtina bi girtî hat kirin. Ji der ve gavên asayî bûyîna dihên avêtin, maske dihên derxistin lê şertên me girtiyan di bin karantîneyê de berdewam in. Tevî ku em du caran hatin aşi kirin. Gardiyan bi aşi ne û her hefte dikevin hundir, tevî ku test-bûyî heftayekê li vir dimînin rewş wiha berdewam e. Ji mirovan re mayîna bi du rojan di malê zehmet e. Em ji meha Adarê ya 2020î ve em di heman rewşê de ne. Bifikirin ku 24 saetan di cihekî de hûn bi tenê sê kes in.

Dewleta ev tişt têrê wê nakin, dest bi venihêrîna me ji şeş mehan carekê, dest bi tabîkirina me ya pergala pûnantajê kiriye. Em vê yekê qebûl nakin. Li gel dema berdanê ya gelek hevalên me hatiye bi hinceta "poşman nebûye" mafê berdana serbest a bi venihêrîna hatiye standin.

Rojnameyên çapemeniya şoreşker-demokrat dişînin bi hinceta ji Saziya Çapemenî û Ragihandinê îlan nagerin nayan dayîn. Bi tenê rojnameyên îlan bigirin didin. Ji van jî yên li bayîyan dihên firotin. Di mijara kovaran de jî bi mehan heman prosedur sepandin. Lê niha em pereyê wan bidin û bibin abone dikarin bigirin. Bi hefteyan lêkolîna kovarên em dibin dikin û nadin. Lê dîsa em li hêviya prosedura serlêdana li dadgehê ji bo kovarên dihên dimînin. Pirsgirêkên em rû bi rû ne ev in.

Di mijara abone bûyîna de di encama îtirazên me kirin de Dadgeha Cezayên Giran biryar da ku mirov dikare kovar û pirtûkên diyarî bistîne. Tevî ku ev biryareke mînak e, rêvebirî dewam dike li danîna şertê abonetiye.

(.....)

Silav û hez li we, serkeftin di xebatên we de! Spas ji bo piştevanî û piştgiriya we. Bi xatirê we, hay ji xwe hebin. Silav li hemû kedkarên çapemeniyê.

Seyîthan Akyuz

Nûnêrê Rojnameya Azadiya Welat ê Edeneyê

(Girtîgeha T ya bi hejmar 4 a Şakrana Îzmîrê - Nameya 24ê Cotmeha 2021î)

Di serî ez silavên xwe yên ji dil li we dikim, hêvî dikim û hûn baş û bi kêf bin.

(.....)

Meha Berfanbarê 12 salên min diqedin, ez ê bikevim sala 13an. Yanî di girtîgehê de dê 12 salên min tamam bibin. Dibe ku hûn bibêjin ka te çi kiriye ku hewqas heps radizî? Hûn biheq in. Vê pirsê ez jî carinan ji xwe dikim. Lê qanih nabim ku tiştên min kirine ne tiştine ez ji ber 12 salan heps razim. Ez dibêim li welatekî herî ne demokrat ê daraza wê bi alf tevdi gere jî, nedibû ku ez hewqas ceza bigirim. Ez bibêjim belkî hûn qanih bibin.

Min ev ceza ji çar dosyeyan girt. Heger ez bi rêz van dosyeyan û hincetên wan û çiqas ceza dane diyar bikim;

- 1-** Li semta Kadîfekaleyê ya Konaka Îzmîrê sala 2003yan xwepêşandeke korsan çedibe. Di vê xwepêşandanê de polîs û yên xwe didin nişandan pev diçin. Kokteylên molotofê diavêjin polîsên bi panzêran midaxele dikin. Piştî bûyerê bi çendan rojan digirin bi ser malan de û hin kesan binçav dikin. Ez jî hatim binçav kirin. Piştî binçav kirina bi çend rojan hatim binçav kirin. Hincet "endamtiya rêxistinê" û bi navê xwe yê paşê "girtina teqemeniyên li cem xwe" bûn. Ji vê dosyeyê ez 13 mehan girtî mam. Min di pey re "ji endamtiya rêxistinê" berat kir, ji "girtina teqemeniyên li cem xwe, neql kirin" û wd. 4 sal û 17 meh ceza girt. Sê hezar banot cezayê pere girt. Tiştê balkêş ew bû ku di kûleya panzêra min molotof avêtiye polîsê karmend, bi esehî teşhîs kiriye, zabitnameya bûyerê li wê gorê serrast kiriye. Yanî polîsê karmend dibêje "ê molotof avêtiye min ne ev yekî din e" lê dadgeh ji avêtina molotofê bi navê xwe yê paşê "girtina teqemeniyên li cem xwe" ceza dide. Dawiyê 4 sal û 17 meh û sê hezar cezayê pereyî (ji ber min ev pere neda ew jî kirin cezayê hepsê.) Dosye ji ber ku beriya 2005an tevahiya razana ji van cezayan nêzîkî 2 sal û niv bûn.
- 2-** Ev dosye jî li Îzmîrê vebû. Hincet berz kirina diruşman bû di pîrozbahiya salan 2007an de. Ew sal ji lewma 4 meh girtî mam. Di pey re min salek ceza girt. Ku ev ceza hat erê kirin cezayê mayî min înfaz kir.
- 3-** Beriya vê ji du dosyeyan ez hatim girtin û hatim berdan. Herî dawî di sala 2009an de hatim girtin. Jixwe ji hingê ve ye bê navbir 12 sal in di girtîgehê de me. Sala 2009an di operasyona bi navê "KCK" ê de hatin binçav kirin. Ji vê dosyeyê min sê sal girtî hatim darizandin. Bêyî ku îfadeyê min were girtin "ji endamtiya rêxistinê" min 12 sal cezayê hepsê girt. Hinceta negirtina îfadeyê min ew bû min dixwest bi Kurdî îfade bidim. Bi vî awayî dosyeya çû Dadgeha Bilind, sala 2014an hat erê kirin û eseh bû. Lê tiştê bû sebeb ku ez 12 sal ceza bigirim çi bû? Belkî hûn bibêjin tiştine pir giring bûn lê na. Di vê dosyeyê de wek "berpirsiyarê çapemeniyê yê Çukurovayê yê KCK'ê" hatim darizandin. Rojnameyên ez dixebitîm Özgür Gündem û Azadiya Welat' bûn;
 - Roja ez hatime girtin, girtine bi ser buroya me ya rojnamevaniyê jî û dest dane ser hard dîskên Ajansa Nûçeyan Dîcleyê. Tişt (nûçe, wêne, nivîs û wd.) ên di vî hard dîskî de kirine hinceta endamtiyê.
 - Kasetên kamerayê yên di arşîva Ajansa Nûçeya Dîcleyê de di heman bisergirtinê de
 - Hebûna posterê Apê Mûsa li buroya me û wêneyên min ê li ber vî posterî hatiye kişandin.
 - Çima ku belavkareke/î rojnameya me li min û ji ber ku Sendîkaya Kedkarên Buroyan aboneyê me ye ji bo nişandayîna lêçûyîna fatûre xwestiye.
 - Hebûna wêneyên Husnu Ablay û Cihan Deniz ên di qezayêke trafikê de canê xwe ji dest dane.
 - Vexwendina civînan bi gera li hevalên buroya xwe ya Mersînê ji bo çêkirina civîna xwe ya herê mê.
 - Sînyala telefonê ya nişaneya ez li taxa lê dimînim di demeke xwepêşandan dihê kirin. Ez li wê taxê dimam ji lewma normal e ku sînyaleke telefonê nişan bide ku ez li wê taxê me. Jixwe ew diyar dikin ku ez beşdarê xwepêşandanê bûme û li wê deverê bûme.
 - Berê du caran ketin û derketina ji girtîgehê. Yanî ev yek wek delîlên endam bûyîna dihên hesab kirin.
 - Di telefona min de hebûna wêne û stranên Kurdî û çend hincetên din.
 - Wek encam ez sê salan girtî hatim darizandin û di tu merheleyê de îfadeyê min jî nehat girtin, bêyî daxistina ji cezayê ji ber halê baş min 12 salan ceza girt. Dadgeha Bilind ceza erê kir, Dadgeha Destûra Bingehîn jî hikm kir ku binpêkirin nîn e. Lê ji ber îhmalkariyê ev dosyeya min neçû DMME'yê. Parêzerê min ê pê re mijûl got ku ne branşa wî ye. Ji ber ku kesê pê re mijûl bibe nîn bû û haya min jî jê nîn bû rewşeke wiha derket holê. Di vê pêvajoyê de, ez nûnêrê buroya Azadiya Welat bûm. Yanî herî dawî di çarçoveya KCK'a Edeyeyê ya sala 2009an ez hatim girtin.
- 4-** Dosyeya bûye sedema darizandin û girtina ceza yekcar sosret e. Mijar ev e; Navenda Çandê ya Mezopotamyayê sala 2009an salnameyek çap kir. Zimanê salnameyan Kurdî ye. Ji bo belav kirina wê ji bo buroya me Edeyeyê nameyek hatiye şandin. Ev salname hêj nû hatibûn teslim kirin û di koliyên girtî de bûn, ekîbên Şaxê Têkoşîna Li dijî Terorê yên Mi-

dûriyeta Ewlehiyê ya Edeneyê girt bi ser buroya me de. Mijara kirine hinceta bisergirtinê jî salnameyên bi Kurdî hatibûn çap kirin. Çimkî bi hinceta "propagandaya rêxistinê" kiriye biryara berhev kirina wan hatibû derxistin. Di vê biserdegirtinê de dest dane ser salname, 3-4 hejmarên cuda yê kovara Özgür Halkê yê me ji bo arşivê bi kar dianîn. Bi ya min ev yek ji bo kirina dozê çekirina hincetan bû. Tevî ku wekî din kovar û wêne hebûn dest nedan. Di encamê de ji vê dozê bi hinceta "endamtiya rêxistinê" min 6 sal û sê meh ceza girt. Paşê di çarçoveya serrastkirinên yasayî yê hatin kirin de, bû sê sal û mehek û pazdeh rojên cezayê hepsê. Sala 2016an ji aliyê Dadgeha Bilind ve ceza hat erê kirin. Hema Dadgeha Bilind bi biryara bi hejmar 2017/5155 got ku "bi sempatiya ji bo rêxistinê ya jî hebandina armanc, nix û bîr û doza rêxistinê, xwendina weşanên di der barê vê yekê de, girtina weşanan li cem xwe, girtina rêzê ji serokê rêxistinê re ne bes in ji bo endamtiya rêxistinê." Min jî ji ber salnameyên Kurdî hêj ji kolîyên wan venebûn û biryara berhev kirina wan hatibû û çend wêne û kovarên arşivê ji "endamtiya rêxistinê" min ceza girt. Daxwaza min a darizandina ji nû ve hat red kirin.

Wek encam; ez sala 2009an hatim girtin û ji hingê ve di girtîgehê de me. Qewlê înfazê yê van çar dosyeyên min ên cezayên wan hatine erê kirin û eseh bûne jî 12ê Rêbendana 2023yan dê biqede. Heke belayeke din bi serê me de nehê, 12ê Rêbendana 2023yan ez ê bihêmberdan. Mafê min ê ji yasayî yê ez ê sala dawîn a cezayê xwe bi serbestiya bi şert û merc biqedînim heye lê ji bo vê yekê jî şertê "ji rêxistinê veqete" datînin ber mirov. Wek ku em tevê rêxistinê bûbin. Di darizandinan de, di her fersenda ku em dikarin îfadeyê xwe bidin, me diyar kiriye ku me di organeke çapemeniyê ya yasayî de rojnamevanî kiriye. Li ser navê me parêzer bi caran heman tişt got. Niha jî wiha dibêjin: "Bibêjin ku em endamên rêxistinê ne û beyan bikin bikin ku hûn ji rêxistinê veqetiyane da ku em xala serbestiya bi venihêrîn pêk bînin û we serbest berdin." Welhasil! Wek ku min got; eger tiştêk bi serê me de nehê. Çimkî niha 6 sal û 3 meh (ev jî endamtiya rêxistinê ye) cezayê min li Dadgeha Bilind e. Çiroka vî cezayî jî ev e:

"Sala 2008an li rêxistina DTP'ê civînek hatiye çekirin, kesê bi navê X (çawa bi dest xistibe) qeydên deng ên vê civînê bi dest xistine, di vê qeyda deng a bi dest xistiye de beyan kiriye ku gava nav hatine gotin navê Seyithan Akyuz jî hatiye xwendin. Paşê ev bûyera bû wek doza "KCK"ê bû sedem ku ez ji "endamtiya rêxistinê" 6 sal û 3 mehan ceza bigirim. Ji xeynê beyana kirina navê min a şexsê heyî di tu derê de navê min nîn e. Yanî li wir tu ne kirineke min ne jî gotineke min nîn e. Ji lewma dozgêrê dozê, tevî lêkolîn û lêpîrsîna bi 12 salan tiştêk nedîtiye û daxwaza berdana min kiriye. Yanî dozgêrê dozê ku doz kiriye û lêpîrsîn kiriye di der barê dozê de wiha dibêje; ne belge ne jî agahiyeke ez pê ceza bidim vî mirovî nîn e. Ji lewma dixwazim were berdand. Lê berovajiyê vê heyeta dadgeha biryara ceza kirina min bi 6 sal û 3 mehan da. Ev cezayê min meha Rêbendana ya sala 2019an girtiye niha li Dadgeha Bilind e. Encam dê çi be ez nizanim. Lê min xwest ez vê jî bi we re par bikim.

Berê ez carekê 13 cara din jî çar meh du caran di girtîgehê de mam. Ev ceza jî ji ber hewldana min a ravekirina dosyeyan bû. Yanî bi temamî 13 sal û niv heps razam. Di van pêvajoyan tevan de ez di rojnameya Özgür Gündem û Azadiya Welat de dixebitîm. Yanî ji xeynê rojnamevaniyê min tu xebat nekiriye. Lê ez dîsa hatim ceza kirin û ev demeke dirêj e ez di girtîgehê de me. A ji wê boneyê ez qanih nebûm ku bergîdana van cezayan ev e. Heke hûn qanih bûbin ji kerema xwe min jî qanih bikin.

Bi giştî rewşa min wek ku min li jor aniye ziman e. Ê bixwaze gotinên min dikare yek bi yek li dosyeyên min binihêre û eseh bike. Çimkî min her tişt wek xwe nivîsiye. Ji lewma dawiyê li vê mijarê tînim û dixwazim bihem ser pîrgirêkên em rû bi rû ne.

Wek ku hûn dizanin piştî hewildana derbeyê ya 2016an wek ji der ve di girtîgehê de jî dest bi serdemeke nû bû. Ji hingê ve rewş ji bo derasayî ye. Hêdî hêdî ev pergala bi meriyet bû û ji xeynê çend sist kirinan her tişt wek xwe berdewam e. Nexweşî jî bi ser de hincet bi hêz kir. Helbet ev rewş ne bi tenê ji bo girtîgeha em tê de wisa ye. Bi qasê em seh dikin li gelek cihan heman tişt diqewimin. Ev yek jî nîşanê mirov dide ku girtîgeh bi politikayê navendî dihên bi rê ve birin. Hêj dê çiqas berdewam bibe nizanim. Hêvîdar im ku zêde neajo û jiyan asayî bibe. Lewre cihên herî pîr pêdivî asayî bûyîne heye girtîgeh in. Ji ber ku tiştên diqewimin bi giştî ne wekî din tiştêkî nabêjim. A rast wekî din tu rewşek nîn e.

Hêvalên hêja ez dizanim hinek dirêj bû lê nedibû ku ewqas kin be çiroka 12 salan. Ji lewma heke min serê we eşandibe li min negirin.

Bi van hest û nestan silav li we tevan. Di xebatê de serkeftin ji we re!

Sîbel Mustafaoglu

**Xebatkara Rojnameya Azadiya Welat
(Girtîgeha Jinan a Cirtî ya Şakranê ya Îzmîrê Nameya 27ê Cotmeha 2021î)**

Ez bi rêzdarî silavan li we dikim. Nameya ku we ji min re şandiye bi hinceta "rêya çêbûna hayê ji hev û din a mensûbên rêxistinên terorê ye û asayîşa saziyê dixê xetereyê ji lewma name bi temami metirsîdar e" dest dan ser. Ez ji hay ji tiştên we nivîsîne nîn im. Ji bo haya we jê hebe bi kurtasî be min xwest hinek binivîsim.

Ez niha di şertên karantînayê de ji bo we dinivîsim. Di odeyêke fetisokî ya bêhewa û bi kam de rûniştî me. Berê ku min du hevok jî binivîsîna ez ê li ber camê rûniştama. Pencereyê çengek asîman je ve xuya dikir bi te dida gotin ku "jiyan li her derê hêjayê jînê ye." Êdî tu espriya wê jî nemaye. Ji ber ku ser cihê hewadar kirinê bi qefesê hatiye girtin min deh sal bi şûn da dev ji edetê xwe yê rûniştina li ber paceyê berda û êdî li cihekî dûrê wê rûdinim. Berê min nan diavêt ber çivîkan. Nanê ku min diavêt ber wan dixwarin, ji xwe re hêlîn çêdikirin û beriya çêlikên xwe bifirînin dianîn cihê ez lê me. Wan jî piştî qefesê terka zindanê kir. Wan her derê em lê bûn hêjayê jiyînê didîtin.

Di zindanê de mirov bikene wek mirov xwe bigihîne ber derê heqiyê, kenîna bi hîrehîr jî ketin hundir di wî deriyî re ye. Çimkî yê tevî her tiştî dikene, wateya rastîn keşif dike. Bêpar bûyîna ji vê yekê di zindanê wan dizanin çi ye? Wek derizîna dîwaran, girtina zengê ya deriyên hesin, kevin bûyîn û mat bûyîna ranzayê nekarîna derketina ji nav wê lînûska mirov vedişêre... Espriya me jî ev e, zindî ye, zengê nagire û hîç kevin nabe.

Welhasil, vegotina şertên em tê de ne dê pir watedar bibûya, lê ji ber ku dê dest bidin ser nikarim binivîsim. Çimkî daxwaznameya min ji wezaretê re şandiye jî nehatiye şandin, dest dane ser. Bi texmîna min hûn di der barê çapemenîvanên di girtîgehan de hûn raporekê amade dikin û agahiyan dixwazin di der barê şert û mercan de.

Wek ku min got em di şertên gelek xedar de dimînin û derfeta me ya em nameyekê bişînin ji der ve nîn e. (...)

Wek ku Xelîl Cibranê ezîz gotiye tiştên min nivîsîne bi tenê ji bo yên min nekariye binivîsinim. Bimînim bi hêvî û liberxwedanê.

Sîbel Mustafaoglu ya me berê name jê re şandibû lê nedabûn piştî vê nameya şand bi gumana dê dest bidin ser nameyê bi rêya malbat û parêzer di der barê rewşa xwe de hin agahî par kirin. Ew agahiyên me berhev kirine li vir par dikin...

- Min nivîsîbû ku dest dane ser nameya we şandiye. Ji lewma min îtiraz kir. Ji ber ku min "Bi vî halê xwe rêvebirî neheqî û nehuqûqiyên dixwaze qebûl dike" got Dadgêriya Înfazê û Dadgeha Cezayên Giran îtiraza min qebûl kir û name da min. Lê dest da ser pûlan û nedan. Pêşî min 21 sal û 10 meh ceza girt. Dosye ji ber kêmasiyên rêbazî xera bû lê hin xalên wê hatin erê kirin. Cara duduyan hatim darizandin. Îcar min 19 sal û 10 meh ceza girt. Daxwaza me ya parastin bi zimanê zikmakî hêmana herî giring a girtina me ya ceza bû. Lê daxwaz hîç nehat qebûl kirin. Tevî nerazîbûnan tevan îfadeyên "nexwest parastinê bike" derbasê zabitnameyan kirin. Tevî lidirabûnan tevan îfadeyên "zimanekî pê nayê zanîn" ya jî "nexwest parastinê bike" derbasê zabitnameyan kirin. Zimanê min ê zikmakî di nav kategoriya "yên nayên zanîn" de cihê xwe girt. Sedema din a herî giring ew bû ku min rojname belav kiribûn. Ji ber ku min rojnameyên rastiyê diqiryan, qetilam û binpêkirina mafan bi belge dikin firotibûn min jixwe sûcê herî mezin kiribû. Dema ku min li Amedê xebata abonetiye dikir ez hatim girtin. Min ew roj bi tenê rojname belav kiribûn. Heman roj bêyî ku bihêlin destên xwe bişom hatim girtin. Di bin çavan de bi bandê plaster swap hatin standin û kirin rapor. Li gor vê raporê min teqemenî bi kar anîbû û ez bi vî "delîl"î hatim ceza kirin. Belkî bihê bîra we, hingê kesek bi destê wî ve boyaxa rojnameyan hebû bi îdiaya "teqemenî" hat ceza kirin. Di rapora tiba edlî xwedêgiravî "bi îspat bû" ku min teqemenî bi kar aniye. Lê di bin heman raporê de bi pûntoyên mezin "swapên bi bandê plaster werin standin nabe ku wek delîl bihên bikaranîn" nivîsîbû. Lewra mirov heste bide bin bandê plaster jî dibe wek jêmayiyê madeyê teqemeniyê. Ji lewma ne bi ewlehî ye û delîl hesab nabe. Îtiraz tev, rapora kesê zana û wd. yek jî nehat qebûl kirin.

- 16ê Sibata 2011an hatim girtin. Ji xalên kirina sûc li ser navê rêxistinê, bikaranîna teqemeniyê, propaganda û dayîna li ber xwe min hikm xwar. Ez li Dîlokê hatim girtin lê Dadgeha Herême ya hingê li Edeneyê bû ez li Dadgeha Cezayên Giran a 6emîn a Edeneyê hatim darizandin. Wek encam; Dadgeha Destûra Bingehîn jî dosyeya min red kir. Ê ez çûm DM-ME'yê. Dîroka derketina min jî 10ê Mijdara 2025 e.

- A rast di nav tabloya ez ê behs bikim girtina ceza ya herî bi mehsûmî ye. Gava ji vir diçûm. Edeyê ji bo dadgehê tişt nema ku nehat serê min. Bi rê de di girtîgehên ez tê de hatim hiştin rû bi rûyê gelek kirinên erjeng hatim. Di girtîgehên Dîlok, Şakran, Alanyayê de tacizê min kirin û rû bi rûyê lêgerîna bi tazî bûm. Ji ber ku min red kir gardiyana jin ez êşkence kirim. Min ji wê boneyê xwest raporê bigirim lê di girtîgeha Şakranê de min rapora derb bûyîne girt. Di der barê vê mijarê de min tu bersiv ji serîlêdanên xwe yên sûc negirt. Sazî û wekîlan jî qewî bersiv nedan. Bi tenê sala pêşîn a ez hatim Şakranê wekîlên CHP'ê hatin li cih vekolîn kirin. Di dawiyê de tu tişt neguherî.
 - Ji pirsgrêkên herî bi cidî yek jê jî tundiya lêgerîna bi tazî ye. Hez bikî bila ji der ve bihê ya jî ji girtîgeheke din... polîtîkayê ji bo şikandina rûmetê ye ji bo girtina teslîm a berpêyî şikandina vîna mirov e. Li dijî vê yekê me ji tu hewldayîne tu encam negirt. Ev sepandin ji aliyê gardiyana jin ve bi rûmet û xurûreke bêpayan dihê pêk anîn. Li her kesî qawîşa yên serbixwe dikin ferz. Li yekî ku hêj dihê darizandin ji aliyê rêvebiriyê ve hikm dihê kirin. Di pey re "heke tu neçî qawîşa yên bi serê xwe tu yê cezayên giran bigirî, hew bihêyî berdan" dihê gotin.
 - Niha girtîgeh mîna komarên bi serê xwe ne. Di tevan de dawîya rayedariyê nîn e, kes lê venanihêre. Herwiha diyar e ku talîmata bi kar anîna hedê xwe dane rayedaran. Lewma ji gardiyana bigire heta bi midûran tev ji key keyperesttir in. Bi yasayê înfazê yê herî dawî hat derxistin şertên me yekcar giran bûn. Jixwe yasa qewî ne li gor huqûqa navxweyî û pergala Komara Tirkiyeyê ye. Dîsa jî wek cezayê ser cezayan li yên di girtîgehan de tê sepandin. Tu hevalê ku dema wî/wê ya berdanê hatiye heta bi niha nehatiye berdan. Bi hincetên ne hincet 8-10 meh taloq li berdana wan xistin. Li gor xwe pergaleke poankirîne çêkirine. Di nav de alîkirin, piştevanî, aborî, ekolojî, asta xwendina pirtûkan û wd. hene. Li gor vê yekê poan didin û xwedêgiravî yên vê berajê vedikin berdidin. Ji bo me krîtera yekane xala poşmaniyê ye. Bi ser de îfadeya "mikur hatina li xwe bi jidilî" jî wek xaleke yasayê lê hatiye zêde kirin. Ji bo ku bibêjin "halê xwe yê baş nîn e divê neyê berdan" misêwa di der barê me de zabitnameyan çêdikin. Bi hincetên "tu li korîdorê meşiyayî, te silav da, te dengê xwe bilind kir û wd" zabitnameyan dinivîsin.
 - Bi cezayên wek xwarina gefanê (dîtin-ragihandin) şertên me yekcar giran dibin. Jixwe bi pandemiyê re girtîgeh tam derbasê îzolasyonê bûn. Bi fizîkî, bi ruhî û bi her awayî. Bo mînak bi van hincetan dest dan ser romana "Li Çiyayê Helgurdê Şerê Ronahî û Tarîtiyê" Kurdî bûyîna, bûyîna di girtîgehê de ya nivîskarî, girtina cezayê heta bi hetayê û di navê pirtûka de hebûn peyva 'çiya'.
 - Gava mirov bi tevahî lê dinihêre dibîne ku tecrîda bi salan li îmralityê tê sepandin li temamê girtîgehan belav bûye. Mafê me yê çapemenî û weşanan sînorkirî ye. Rê nadin çapemeniyê azad. Ji der ve ketina hundir a weşanan heftayî, mehane qedexeyê. Pirtûk ji du mehan carekê wek diyarî tê qebûl kirin. Misêwa dest didin ser ên tîn standin jî. Me ji zû de weşanan bi Kurdî nestandine. Di encama serîlêdanên cur bi cur de hêdî hêdî digirin. Lê ji bo ku negirin biryarên cihê bi cihê derdixin.
